# Netewetiya Kurdî û Rengvedana Wê di Helbesta Kurdî ya Nû de

# Kurdish Nationality and Its Repercussions in the Modern Kurdish Poetry

Zülküf ERGÜN*

**PUXTE**

Netewetiya Kurdî li hember netewetiya resmî ya împaratoriya Osmanî û di bin karîgeriya hişyariya neteweyî ya Ermenan de peyda dibe. Piştî Meşrûtiyeta Duyem gotara neteweyî ya helbestvanên Kurd bi awayekî giştî rengekî çandî û modernxwaz werdigire, loma jî xwendin, pêşketin û merîfet dibe mijara sereke ya helbestvanên Kurd ên vê serdemê. Ji salên çilî û pê de di bin karîgeriya îdeolojiya marksîst de helbestvanên Kurd ji pêşiyên xwe cudatir naverok û taybetmendiyên netewetiya Kurdî jinûve dadirijînin û ji bo dabînkirina arîkariya bereya komunîst pêkhateya neteweyî li gorî îdeolojiya marksîst pênase dikin. Ev yek di maweya Şoreşa Eylûlê de di helbestên Hejar de tê rexnekirin. Lewra dema dewletên komunîst li hember şoreşgêrên Kurd piştgirî didin hukumeta Ebdulkerîm Qasim û komunîst kurdîtiyê bi paşverûtiyê tawanbar dikin hevgirtina netewetiya Kurdî û bereya komunîst hildiweşe. Ev jî nîşan dide ku di nav sed salî de li gor pêşhatên nû yên cîhanê di naverok û forma netewetiya Kurdî de guherîn çê dibin û ev guherîn bi awayekî herî baş di gotara helbestvanên neteweperwer ên Kurd de reng vedidin.

**Bêjeyên sereke:** netewetiya Kurdî, helbesta Kurdî ya nû, netewetiya çandî û modernxwaz, netewetiya çeprew, kurdayetî.

**Wanebêj, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, Turkiye.**

Lecturer, Mardin Artuklu University, Living Languages Institute, Kurdish Language and Culture Departmant, Mardin, Turkey.

e-mail: zxweshevi@gmail.com

**ABSTRACT:**

Kurdish nationalism emerged counter to formal nationalism of Ottoman Empire under the influenced of Armenian national awakening. After the Second Constitutional Era, discourse of Kurdish poets turned into a cultural discourse and a discourse wishing for modernism. Thus, reading, progressivism, and information were the priority issues of the poets of that period. After 1940s, Kur-

dish poets, far from their predecessors, reorganized features and contents of Kurdish nationalism under the influence of Marxist ideology, additionaly, components of nationalism were defined according to Marxist ideology to assist communist front. However, this discourse was criticised by the poet Hejar during the September Revolution. This was because, communist states supported Ebdulkerim Qasim against Kurdish revolutionist and communists accused Kurdish activities of being reactionist. This shows that the structure and content of Kurdish nationalism altered according to the changes in the world in that century and those changes were best reflected by the discourse of nationalist Kurdish poets.

**Keywords:** Kurdish nationalism, modern Kurdish poetry, cultural and modernism wishing nationalism, leftist nationalism, Kurdism

## 1. DESTPÊK

Netewetî wek îdeolojiyeke siyasî tenê bi siyasetê re sînordar nemaye û rengvedanên wê yên civakî, hizrî, hunerî û edebî jî çê bûne. Ji ber vê mirov dikare bibêje ku netewetî di nav war û dîsîplînên ciyawaz de bûye pireke peywendiyê û çavkaniyeke hevbeş a dahênanê. Di mînaka netewetiya Kurdî de jî di navbera netewetî û edebiyatê de û bi taybetî jî di navbera netewetî û helbestê de têkiliyeke înteraktîf çê dibe. Ji aliyekî ve netewetî bergeheke nû li ber helbesta Kurdî vedike û wê bi naverokeke nû dadigire, ji aliyê din ve jî helbest dibe hilgirê herî çalak ê îdeolojiya neteweyî û wek amrazeke populer ji bo avakirin û belavkirina wê roleke girîng digêre. Ji ber vê têkiliya du alî jî ji destpêka netewetiya Kurdî heta roja îro hemû reng û taybetiyên netewetiya Kurdî di helbestê de reng vedide û helbest dibe cihê bercestebûna hizrên netewetiya Kurdî.

Di vê vekolînê de ji ber çendîn taybetmendiyên wê yên xweser serhildana Şêx Ubeydulah (1880) wek destpêka netewetiya Kurdî hatiye destnîşankirin û heta dawiya Şoreşa Eylûlê (1975) netewetiya Kurdî bi riwangeheke siyasî, dîrokî û edebî di ser çar qonaxan de hatiye dabeşkirin. Qonaxa damezirandinê bi helbestên Hacî Qadirê Koyî (1816-1897) û Ebdurehîm Rehmî (1890-1958), qonaxa netewetiya çandî û modernxwaz bi helbestên Pîremêrd (1867-1950), Ebdurehîm Rehmî, Şêx Nûrî Şêx Salih (1896-1958), Bêkes (1905-1948) û Zêwer (1875-1948), qonaxa netewetiya çeprew bi helbestên Goran (1904-1962), Cegerxwîn (1900/1903-1984), Qani‘ (1898-1965), Qedrî Can (1911-1972), Hejar (1920-1991) û Hêmin (1921-1986) û qonaxa kurdayetiyê jî bi helbestên Hejar hatiye berçavkirin û di maweya sed salî de guherîna gotara netewetiya Kurdî di çarçoveya helbestê de hatiye destnîşankirin.

## 2. PEYDABÛNA NETEWETIYÊ

Neteweti wek îdeolojiyeke siyasî di dawiya sedsala 18an de pêşî li Îngiltereyê peyda bibe jî bi Şoreşa Fransî û seferên Napolyon re li hemû cîhanê belav dibe. Bi hêz û coxrafyaya xwe ya berfireh herçend netewetî xwedan formeke cîhanî be jî di nav mercên cuda de rengvedanên wê yên ciyawaz çê dibin (Anderson, 2011: 19). Di vê çarçoveyê de netewetiya Rojhilat jî di bin karîgeriya Rojava de peyda dibe û mirov dikare bibêje ku ev cure netewetî berhema dagirkeriya dewletên neteweyî yên rojavayî ye. Lewra piştî dagirkirina Misirê ji aliyê Napolyon ve hizir û rêbazên Rojavayî derbasî vî welatî dibin (Hobsbawm, 2012: 160) û li ser destê Mehmed Elî Paşa (1769-1849) yekem car di cîhana îslamê de bingeha dewleteke neteweyî tê danîn.

Netewetî ji ber ku wek çemkeke siyasî û civakî bi amrazên moderniyê tê darijtin û bi êrîşkarî û kolonyalîzmê tê belavkirin ji aliyê gelên bindest ve bi başî bê pêşwazîkirin jî, ji bo desthilatdarên monarşîk ên rojhilatî wek metirsiyeke siyasî derdikeve holê. Ji ber vê dema di mînaka Misir û Yûnanîstanê de di nav Împaratoriya Osmanî de tevgerên neteweyî dest pê dikin desthilatdarên Osmanî ji neçarî berê xwe didin pêvajoyên modernî û netewetiyê, da ku li hember van pêşhatên siyasî û ciyawaziyên çandî û neteweyî bikarin li ser piyên xwe bimînin. Ji ber vê çendê jî netewetiya Osmanî bi destê Sultan Mehmûdê Duyem (1808-1839) û li ser şopa mînakên din ên sîstemên monarşîk ên mîna Birîtanya, Almanya, Rûsya û Avusturya- Macarîstanê di şiklê netewetiyeke resmî de derdikeve holê.

Netewetiya resmî bi gotina Anderson di encama têkelkirina netewe û xanedaniyê de derdikeve holê (Anderson, 2011: 103) û di bin zexta belavbûna netewetiyên zimanî yên populer de wek karvedana parastina xanedaniyê xwe nîşan dide (Anderson, 126). Loma jî nûnerên netewetiya Osmanî dixwazin bi modernkirinê xwe li hember Rojava biparêzin û bi navendîkirin û kontrola navxweyî jî pêşî li serhildanên kêmîneyên nav dewleta Osmanî bigirin. Bi vî awayî xanedanên Dewleta Osmanî di bin nav û unwanên cuda cuda de hêdî hêdî berê xwe didin polîtîkayên netewetiya resmî û ji bo gihîştina armancên xwe jî pêvajoyên modernî û netewetiyê piyade dikin.

Li hember vê, gelên bêdesthilat ên nav Dewleta Osmanî jî berê xwe didin netewetiyeke azadîxwaz ku damezirandina dewleteke neteweyî dike armanc. Her di vê çarçoveyê de yûnanî di encama serhildana 1821-1830î de li ser destê çîna navîn û bi piştevaniya gel û dewletên ewrûpayî (Hobsbawm, 2012: 156) dewleteke neteweyî dadimezirînin û ji bo gelên Osmanî dibin mînaka serkeftina neteweyeke bêdesthilat. Loma jî serxwebûna Yûnanîstanê ji bo gelên din ên Osmanî dibe modelek û heta Cenga Mezin jî karîgeriya wê dewam dike. Bi gotina Jusdanis yûnanî bi vî awayî peyameke neteweyî didin cemaetên din ên nav împaratoriyê (Jusdanis, 1998: 63) û dibin sedema hişyariya wan jî.

## 3. WEK KARVEDANA NETEWETIYÊN DEWRÛBER PEYDABÛNA NETEWETIYA KURDÎ Û RENGVEDANA WÊ DI HELBESTA KURDÎ YA NÛ DE

Wek encama netewetiya resmî ya dewleta Osmanî û polîtîkaya wê ya navendîkirina dewletê di dawiya nîvê yekem ê sedsala 19an de hemû mîrektiyên Kurdan bi destê dewletê tên hilweşandin. Jidestdana nîvxweseriya siyasî ya desthilatdarên Kurdî bibe sedema serhildan û karvedanên cuda cuda jî, ev karvedan, venaguherin serhildanên neteweyî. Loma jî yekemîn nîşaneyên netewetiya Kurdî di sala 1880î de bi serhildana Şêx Ubeydulahê Nehrî re derdikevin. Lewra Şêx di danûstendinên xwe de digel dîplomatên Îngilîz, herwekî ku Hamit Bozarslan ji R. Olson radigihîne, diyar dike ku Kurd neteweyeke cuda ne û hewl dide Kurdên Osmanî û Îranê bike yek (Bozarslan, 2005: 202). Herweha Şêx Ubeydulah di nameyekê de, ku ji bo Dr. Cochranê mîsyonerê amerîkanî şandiye, diyar dike ku "gelê Kurd bi 500.000 malbatî zêdetir neteweyeke cuda û taybet e, mezhebê wan ji mezhebê ewên din cihê ye qanûn û dab û nerîtên wan ên taybet hene." Bi vî awayî Kurdan wek neteweyekê li hember her du gelên Tirk û Fars ên musluman û neteweyên dewrûber bi ciyawaziya wan a neteweyî pênase dike (Jwaideh, 2014: 167).

Eger em vê serhildanê wek seretaya peydabûna netewetiya Kurdî qebûl bikin em dibînin ku ji bilî tevgerên neteweyî yên herêma Balqanan, Cenga Osmanî û Rûsan û hişyariya neteweyî ya Ermenan jî kar li ser peydabûna netewetiya Kurdî kiriye. Lewra di sala 1878an de di Peymana Berlînê de parastina Ermenan dikeve rojeva dewletên mezin û di heman salê de jî partiya Hinçakê wek partiyeke neteweyî ya ermanan tê avakirin (ʻElî, 2013: 153). Di encama van pêşhatan de jî Ermen dixwazin bi piştgiriya Rûsyayê û dewletên mezin ên Ewrûpayê li ser beşek ji axa Kurdistanê Ermenistaneke mezin ava bikin. Ji ber vê jî yekem car netewetiya Kurdî wek karvedana netewetiya Ermenan derdikeve holê. Loma jî Djene Rhys Bajalan yek ji sedema serhildana Şêx Ubeydulah jî gotegota damezirandina dewleteke serbixwe ya Ermenan dizane li herêma Wanê (Bajalan, 2010: 64-65).

Di helbesta Kurdî de yekem car netewetiya modern a Kurdî li ser destê Hacî Qadirê Koyî derdikeve û hevterîbê rûdanên siyasî yên wê serdemê di dereceya yekem de li dijî netewetiya Ermenî û di dereceya duyem de jî li dijî serdestiya Osmanî û Îranê wek karvedanekê peyda dibe. Hacî li dijî serdestiya Osmanî û Îranê Kurdan ji bo serxwebûnê han bide jî herî zêde netewetiya Kurdî li dijî netewetiya Ermenî sor dike. Lewra di wê serdemê de di gelek navçeyan de Kurd û Ermen bi awayekî têkel dijîn û armancên siyasî yên Ermenan metirsiya jidestdana beşek ji axa Kurdistanê derdixe holê. Loma jî Hacî di helbesta "Xakî Cizîr û Botan" de bal dikêşe ser vê metirsiyê û di çarçoveya ajîtasyona neteweyî de diyar dike ku Ermen dixwazin axa Kurdistanê bikin Ermenîstan û eger bigihîjin vê armanca xwe dê

nehêlin hozên Kurdî biçin zozanan, dest bavêjin keç û sêwiyan, di şûna mescîdên Kurdan de, dêrên xwe daynin, di şûna qazî û muftiyan de, metran û rehbanan tayîn bikin, dengê muezînan kip bikin, naqosên xwe lê bidin û hemû Kurdan bikujin (Koyî, 2707: 78).

Hacî ji ber ku netewetiya Kurdî li dijî netewetiya Ermenî datîne, di nav diyolegeke dijberane de ji aliyekî ve Ermeniyan wek metirsî destnîşan dike ji aliyê din ve jî wan wek pîvana hizra neteweyî dike modeleke şênber ji bo netewetiya Kurdî. Ji ber vê çendê dema dixwaze Kurdan di warê yekîtî, pêşketin û xwendinê de han bide careke din berê xwe dide Ermenan û diyar dike ku Ermen xîretkêşê hev in, ji bo bidestxistina zanîna ceng û hunerê, mezin û biçûkên xwe dişînin Ewrûpayê (Koyî, 82) û divê Kurd jî mîna wan bikin û ji wan paşve nemînin.

Hacî ji bilî Ermenan netewetiya Kurdî li hember serdestiya Osmanî û Îranê jî derdixe pêş û dema dibêje Kurd "Munqadî 'Ecem mutî'î rom in / Mehkûmî xerrat û hîz û dom in" (Koyî, 2707: 162) ji aliyekî ve vê bindestiyê nîşan dide û ji aliyê din ve Kurdan li hemberî netewetiya serdest hişyar dike. Bi dîtina wî Kurd di navbera "killawsûr û killawreşan" de yanî di navbera îranî û osmaniyan de wek "gayê beş" (Koyî, 212) bi perîşanî li holê mane. Li hember êrîşên Rûs û Ermenan jî Hacî diyar dike ku divê Kurd pişta xwe bi romiyan ve girê nedin, lewra ew ketine etra xwe û divê tu hêvî ji wan neyê kirin. "Romî wekû benî mûn kes piştyan pê nebestê / Kewtûne dawî xoyan sergeşte mawin heyran" (Koyî, 79). Ev nîşan dide ku Hacî li hember desthilata navendî ya van her du dewletan bîr bi serxwebûnê dibe û dixwaze Kurd çarenûsa xwe bi destê xwe diyar bikin.

Herçend netewetiya Kurdî di pêşengiya Hacî Qadirê Koyî de di zemîna moderniya ewrûpayî de serî hilde jî di bin karîgeriya netewetiya Ermenî de bi dîn re dikeve nav têkiliyê û bi şiarên dînî bergirî li xwe dike. Li gorî Celîlê Celîl diyardeya bihêzkirina netewetiya Kurdî bi gotara dînî vedigere serhildana Şêx Ubeydulah û dema Şêx Ubeydulah Kurdan li hemberî Şahê Îranê û Sultanê Osmaniyan han dide bangeşeyeke dînî bi kar tîne, loma jî diyar dike ku bernameya Şêx Ubeydulah yekemîn bername ye ku di dîroka tevgera azadîxwaz a Kurdan de kariye, siyaset û dîn bi awayekî baş bike yek (Celîl, 1985: 21). Ji ber vê ji serhildana Şêx Ubeydulah heta serhildanên Şêx Mehmûd û Şêx Seîd netewetiya Kurdî bi dîn re dikeve nav diyalogekê û armancên netewetiya Kurdî li ser zemîneke dînî tên rewakirin. Ev diyardeya neteweyîkirina dîn tîne holê, lewra di pêvajoya milmilaneyên neteweyî de bi gotina Smith dîn wateyeke etnîk û neteweyî werdigire (Smith, 2002: 207), dikeve bin barê hizrên neteweyî û bi sembol û ciyawaziyên xwe yên çandî dibe kana manewî ya neteweyê. Paul Zawadzki jî diyar dike ku neteweperwerî di çarçoveya armancên xwe yên siyasî de dîn dixe nav bunyeya xwe (Zawadzki, 2010: 228) û teşeyeke nû didiyê. Loma jî ji Hacî Qadirê Koyî heta Ebdurehîm Rehmî Hekarî

di gotara neteweyî de bikaranîna jargonên dînî wek formeke taybet a netewetiya Kurdî derdikeve holê ku di vê peywendiyê de hertim armancên neteweyî li pêşiya armancên dînî ne.

Bêguman ji destpêka netewetiya Kurdî heta salên 1940î ayet û hedîs û gelek remzên dînî di helbestên Hacî, Pîremêrd, Şêx Nûrî, Bêkes, Zêwer û gelek helbestvanên din de hatine bikaranîn, lê ji van hemûyan zêdetir wek formeke taybet a netewetiya Kurdî têkelkirina gotara neteweyî û dînî herî zêde di helbestên Ebdurehîm Rehmî Hekarî de tê dîtin. Ji bilî hin helbestên wî yên dînî helbestvan di helbestên xwe yên neteweyî de jî gelek metaforên dînî bi kar tîne û dîn dike zemîneke bihêz a manewî ji bo armancên neteweyî. Bo nimûne dema mirov helbesta wî ya “Bang”ê di ser re bixwîne mirov dibêje qey helbestvan behsa banga mela dike û ji bawermendan dixwaze ku guhê xwe bidin mela û biçin mizgeftê nimêja sibehê bikin, lê helbestvan bi zimanekî metaforîk ê ku kar li ser Kurdan dike diaxive û bi riya van îmajên pîroz peyameke neteweyî dide. Jixwe navborî van metaforên xwe di nivîsa xwe ya “Xewa Me” de ku di kovara *Jîn*ê de li bin vê helbestê hatiye weşandin, bi hûrdekarî rave dike û mebesta xwe bi zelalî diyar dike. Di vir de “bang” bangeke neteweyî ye, “mela” pêşengên neteweyî ne, “mizgeft” qada xebatê ye, “nimêj” têkoşîna neteweyî ye, “xew” nezanîn e û “wextê sibehê” jî paşveman û tengiya demê ye ku bi dîtina wî eger Kurd xwe gîro bikin dê negihîjin armancên xwe yên neteweyî (Rehmî, 1985: 193-194).

Ebdurehîm Rehmî di helbesta xwe ya “Selaya Şevê” de jî careke din ji bo diyarkirina nazikiya demê û hişyarnebûna Kurdan metaforeke dînî bi kar tîne. Lewra “sela” ji bo ragihandina rûdaneke mirinê yan jî tiştekî girîng tê dayîn û eger ev di şevê de bê dayîn ev acîliyet û girîngiya peyamê nîşan dide. Helbestvan hişyariya neteweyî ya Kurdî ew çend girîng dibîne ku bi metafora “selaya şevê” dixwaze bibêje eger Kurd hişyar nebin dê bi gotina wî “mehû” bibin (Rehmî, 1985: 349). Di helbesta xwe ya “Heyyealessala”yê de jî careke din metafora “sela”yê bi kar tîne. Mela derdikeve ser minareyê, li wir selayê dixwîne, lê wateya selaya wî bi peyamên neteweyî dagirtiye. Ji ber ku dijmin hindik maye welat dagir bike ji xelkê dixwaze ku wextê xwe ji dest nedin, “guhê xwe nedin îblîsê xirab û zûka ji xewa xefletê hişyar bibin” (Rehmî, 1985: 582).

Bêguman di têkelkirina gotara dînî û neteweyî ya Ebdurehîm Rehmî de wek formeke taybet a netewetiya Kurdî ya wê serdemê hin hokarên kesî û demî diyarker in. Navborî ji bilî ku kesayetekî dîndar û zanayekî dînî ye herweha di maweya Cenga Cîhanê ya Yekem de li dijî êrîşên Rûs û komîteyên Ermenan wek şervanekî dilxwaz di parastina welat de beşdarî dike û rûbirûyê netewetiya Ermenî û Rûsî dibe. Loma jî di gotara wî ya neteweyî ya dînî de ji bilî taybetmendiyên wî yên kesî rikeberiya di navbera Kurd û Ermenan û metirsiya Rûsan diyarker in. Di

vê çarçoveyê de di nivîsa xwe ya “Halê Me yê Hazir” de diyar dike ku eger Kurd nebin xwediyê welatê xwe dê Ermenî bi piştevaniya dewletên mezin dest daynin ser Kurdistanê û wê ji Kurdan bistînin (Rehmî, 1985: 348). Ji ber vê çendê ye ku metaforên dînî yên helbestvan di çarçoveya ciyawaziya dînî ya Kurd û Ermenan de ji mebesteke dînî zêdetir xizmeta armancên neteweyî dikin.

## 4. RENGVEDANA NETEWETIYA ÇANDÎ Û MODERNXWAZ DI HELBESTA KURDÎ YA NÛ DE

Bi Şoreşa Meşrûtiyeta Duyem re (1908) netewetiya Kurdî derbasî qonake nû dibe. Ji vir û pê de netewetiya Kurdî di çarçoveya rêxistinên civakî û siyasî de tê temsîlkirin û heta destpêka salên 1940î jî komeleyên Kurdî dibin cihê dahênana gotar û çanda neteweyî, lewra di bin baskên van komeleyan de bi piranî wek organên wan ên resmî yan rojnameyek yan jî kovarekê tê derxistin û ev jî dibin cihê geşbûna edebiyata Kurdî ya neteweyî. Hema bibêje hemû kovar û rojnameyên Kurdî yên ku li Stenbolê û li cihên din tên derxistin yan ji aliyê komeleyekê ve tên derxistin yan jî bi piştgiriya komeleyekê dikarin li ser piyan bimînin. Jixwe piştî ragihandina Şoreşa Meşrûtiyetê dema yekemîn komeleya Kurdî bi navê “Kürt Teavün ve Terakki Cemiyeti” (Komeleya Piştgirî û Pêşketina Kurdan) tê damezirandin bi heman navî rojnameyek jî tê derxistin û rêvebirê rojnameyê Tewfîqê Silêmanî (Pîremêrd) di yekemîn jimareya rojnameyê de hem li ser navê komeleyê hem jî li ser navê rojnameyê diaxive û bi vî awayî diyar dike ku komele û rojname bi hev ve girêdayî ne.

Riwangeha neteweyî ya komeleyê di yekemîn jimareya *Kürt Teavün ve Terakki Gazetesiyê* de (Rojnameya Piştgirî û Pêşketina Kurdan) di bin sernavê “Cemiyetin Beyannamesi” de tê diyarkirin. Li gor vê, komele di çarçoveya “qanûna esasî” de ku xwe dispêre “şerîet”ê, dabînkirina pêdawîstiyên serdemî û pêşxistina “qewmê necîb ê Kurd” ji xwe re dike armanc û diyar dike ku ev, dê di çarçoveya bihêzkirina peywendiyên medenî yên digel Ermenan û parastina yekîtiya axa Osmanî de bê encamdan (“Cem‘iyetin Beyannamesi”, 1998: 40). Babanzade Îsmaîl Heqî, vê pozîsyona Kurdan weha pênase dike: “Kurd di pileya yekem de îslam in, paşê osmanî ne û li dû wî jî Kurd in” (Babanzade İsmail Hakkı, 1998: 45). Bi vî awayî komele di nav yekîtiya Osmanî de dawa parastin û pêşvebirina mafê Kurdan dike.

Di vê serdemê de netewetiya Kurdî û netewetiya Tirkî ya îtîhadiyan carinan rûbirûyê hev bibin jî bi giştî Kurd di nav yekîtiya dewleta Osmanî de dawa mafên çandî û neteweyî dikin. Babanzade Îsmaîl Heqî bi vê bîr û baweriyê di nivîsa xwe ya “Kürtçeye Dair”ê de (Derbarê Kurdî de) diyar dike ku gelên musluman ên Osmanî ji bilî Tirk û Ereban bi zimanê xwe nikarin perwerde bibin. Kurd, Laz, çerkez

û arnawûd ji vî mafî bêpar in. Bi dîtina wî ziman wasiteya bidestxistina îlm û fen e, loma jî ji bo pêşketina neteweyan tiştekî pêwîst e. Nivîskar bal dikêşe ser niyeta pişaftina Kurd, Laz, çerkez û arnawûdan di nav Tirkan yan Ereban de û diyar dike eger tiştekî weha rûbide ev dê bibe zulmeke gelek mezin û dê sûda wî ji tu kesî re nebe. Bi dîtina wî Kurd hezar sal in hene, ne îranî, ne romayî, ne Ereb, ne Teter û ne jî Tirkan nekariye zimanê Kurdî ji nav bibin û axêverên vî zimanî hertim hebûna xwe parastine. Li ser vê metirsiyê nivîskar pêşniyaz dike ku divê di serî de rêziman û ferhenga Kurdî bê danîn paşê dîroka neteweyî ya Kurdan bê nivîsîn û herî dawî jî çi helbestên nivîskî û berhemên edebî hebin bên komkirin. Lewra bi dîtina wî silameta milet di meʿrîfetê de ye û kilîtê meʿrîfetê jî ziman e (Babanzade İsmail Hakkı, 1998: 141-143).

Mirov dikare bibêje ku nivîsa "Garbla Şark, Milliyet Cereyanları"yê ya Harpûtlu H.B. riwangeha neteweyî ya vê serdemê xulase dike. Bi dîtina Harpûtlu H.B. çawa ku Rojava bi hizir û hestên nû yên neteweyî pêş ketiye, ev hêza nûbûnê dê karîgerî li ser Rojhilat û cîhana îslamê jî çê bike û bibe sedema guherînên mezin. Çawa ku Erebên Misirê û Teterên Rûsyayê bi riya vekirina komeleyên zanistî û xêrxaziyê gihîştine asteke pêşketîtir divê Kurd jî hişyar bibin û li ser vê şopê bimeşin (Harpûtlu H.B., 2013: 104). Ev ji aliyekî ve aşkerakirina kodên neteweyî yên komeleyên Kurdî ne ku di vê serdemê de di bin siyaseta yekîtiya axa Osmanî de danîna hîmên netewetiya Kurdî ji xwe re dikin armanc. Amir Hassanpour jî dema behsa taybetiyên neteweyî yên vê serdemê dike, dibêje bi "Kürt Teavün ve Terakki Cemiyeti" û pêşengên Kurd, ji bo xwedîkirina netewetiya Kurdî rojnamegeriyê, weşana pirtûkan û pêşxistina zimanê Kurdî wek amraz bi kar anîne (Hassanpour, 2005: 131).

Nerîta komeleyên çandî û siyasî yên Kurdî li Stenbolê piştî belavbûna dewleta Osmanî û parçebûna Kurdistanê bi ser çar dewletan de li Silêmaniyê dewam dike. Ronakbîrên ku ji Stenbolê vedigerin Silêmaniyê di çarçoveya netewetiyeke çandî de li vî bajarî dirêje bi kar û çalakiyên xwe didin. Di vê çarçoveyê de "Komelay Kurdistan" di sala 1922yan de tê damezirandin û Mistefa Paşa Yamulkî wek serokê komeleyê yek ji wan kesayetan e ku li Stenbolê vegeriyaye Silêmaniyê û şarezayê xebatên çandî û siyasî yên dezgehên sivîl e. Loma jî komele herwek komeleyên Stenbolê bi navê *Bangî Kurdistan* rojnameyek derdixe ku ronakbîrên diyar ên Silêmaniyê tê de dinivîsîn. Armanca komele û rojnameyê herwek komele û rojnameyên li Stenbolê belavkirina xwendinê, pêşxistin û hişyarkirina Kurdan e bi riya îlm, meʿrîfet û hunerê (ʿElî, 2013, 195-196).

"Komeley Zanistî Kurdan" jî di vê çarçoveyê de di sala 1926an de li Silêmaniyê tê damezirandin. Mîna ku di bernameya wê de jî hatiye, armanca vê komeleyê jî belavkirina zanist û meʿrîfetê, vekirina xwendingeh û pirtûkxaneyan, nivîsîn

û wergerandina pirtûkan, weşandina rojnameyan û lidarxistina konferansan e. (Kutschera, 2001: 133) Her di çarçoveya van komeleyan de li Silêmanî, Bexdad û Hewlêrê çendîn komeleyên din ên mîna Komeley Lawanî Kurd, Komeley Zerdeşt, Yaney Serkewtin, Komeley Çaksazî Kurdî, Komeley Hawar, Komeley Birayetî, Komeley Edebî Kurdistan, Komeley Pêşkewtin û Azadî Kurdî jî tên damezirandin (Mîre, 2012: 37-40) ku mirov dikare bibêje hemû jî li ser heman nerîta komeleyên berî xwe kar dikin.

Komeleyên Stenbol û Silêmaniyê wek dezgehên çandî herçend carinan bi gotareke siyasî derkevin pêş jî bi giştî di çarçoveyeke sivîl û çandî de dimînin û damezirîner û çalakgerên wan wek kesayetên xwendewar û bajarî di avakirina çandeke neteweyî û modern de roleke sereke dibînin. Helbestvanên Kurd ên vê serdemê wek endam û alîgirên çalak ên van komeleyên navborî di çarçoveya armancên van komeleyên sivîl de nûnertiya netewetiyeke çandî û modern dikin û di çarçoveya modernkirina civata Kurdî, pêşvebirina çand û zimanê Kurdî, handana Kurdan ji bo zanist û hunerê, bihêzkirina yekîtiya neteweyî ya Kurdan û xurtkirina hişmendiya neteweyî de pêşengiya vê peyama nû dikin. Yadgar Resul jî di çarçoveya peywendiya komeleyên Kurdî û geşkirin û nûkirina edebiyata Kurdî de diyar dike ku helbestvanên Kurd van komeleyan dikin mînberek ji bo avakirina edebiyateke nû ya neteweyî, loma jî damezirandina komeleyên Kurdî îlham dide helbestvanan û dibe çavkaniya îlhamê ji bo wan (Ballekî, 2005: 31).

Bêguman di nav helbestvanên vê serdemê de Pîremêrd xwedan roleke girîng û pêşeng e. Lewra her ji destpêkê ve endamekî çalak ê van komeleyên Kurdî ye û di piraniya kovar û rojnameyên Kurdî de bi nivîs û helbestên xwe di avakirina gotara neteweyî ya çandî û modernxwaz de cih digire. Pîremêrd di helbesta xwe ya "Damezirandinî Komelley Zanistî" de di mînaka damezirandina "Zanistî"yê de rola komeleyan di pêşvebirin û modernkirina Kurdan de destnîşan dike û diyar dike ku bi vebûna "Zanistî"yê gula hêviya welat pişkiviye û milet dê bi "Zanistî"yê pêşkeve. Lewra "Zanistî" dê asta milet bilind bike û Kurdan bi Ewrûpayê bide nasîn. Ji vî aliyî ve "Zanistî"yê gelek bi nirx dibîne û wê wek hêviya paşerojê dide zanîn (Pîremêrd, 2001: 119). Helbestvan di vê helbestê de hem amaje bi navê komeleyê dike ku "Zanistî" ye hem jî amaje bi armanca komeleyê dike ku ew jî di wateya xwendin û zanistê de "zanistî" ye. Lewra di xwendingeha şevê ya vê komeleyê de zarokên bêkes dixwînin û helbestvan ji Xwedê hêvî dike ku "Zanistî" ji bo xwendina zarokên bêkes her bimîne, ji ber ku bi xwendina şevê ya van zarokan perdeya tarî ya nezanînê tê çirandin û roja zanistê derdikeve holê" (Pîremêrd, 348-349). Wekî diyar e, Pîremêrd Ewrûpayê wek pîvana pêşketinê dide zanîn û xwendina zanistên nû û dezgehên çandî jî ji bo gihîştina vê armancê wek amrazên girîng li qelem dide.

Pîremêrd sedema paşvemana Kurdan di nezanîn û bêtifaqiya wan de dibîne û diyar dike ku qewmê Kurd ji ber ku armanca xwe baş nas nekiriye, di nav gerîneka jiyanê de gêj bûye (Pîremêrd, 2001: 145). Helbestvan ji bo rizgariya Kurdan tifaqeke bi komelî û xwendinê pêwîst dizane û di helbesta xwe ya "Karwan"ê de diyar dike "eger miletek xwedan fen û xwendewariyê nebe nikare xwe ji derdan rizgar bike û hêvî dike berî ku bimire miletê xwe di asteke pêşketî de bibîne (Pîremêrd, 282). Lewra xewna helbestvan ew e ku rojek ji rojan Kurdistaneke pêşketî û modern bibîne û vê xewna xwe jî di helbesta xwe ya "Xitukey Şa'îrêk e Têdega Xoy"ê de berçav dike ku di sala 1927an de nivîsiye. Helbestvan bi vê helbestê Kurdistaneke dewlemend û pêşketî berçav dike ku bi kargeh û nefta xwe serçaviya dewlemendiyê ye û bi hêlên xwe yên hesinî û bi geştên xwe yên firokeyan digel Ewrûpa û Rûsyayê di nav têkilî û danûstendinê de ye. Helbestvan ji Xwedê hêvî dike ku van tiştan ji bo Kurdan bi cih bîne û welatekî avadan û modern bike nesîbê wan (Pîremêrd, 120-121).

Yek ji helbestvanê çalak ê komeleyên Kurdî yên li Stenbolê jî Ebdurehîm Rehmî Hekarî ye ku wek endamê "Kürt Talebe Hêvî Cemiyeti" (Komeleya Hêviyê ya Xwendekarên Kurdan) û "Kürdistan Teali Cemiyeti" (Komeleya Bilindkirina Kurdistanê) û nivîskar û helbestvanê kovara *Jîn*ê di helbestên xwe de ji bo pêşketina neteweya Kurd zanistê, vekirina xwendingehan û xebat û hevgirtina civakî pêwîst dizane. Helbestvan di helbesta xwe ya "Selaya Şevê" de paşveman û bindestiya Kurdan bi nezanînê ve girê dide û çareya rizgarbûna ji vê r ewşê jî di xwendinê de dibîne (Rehmî, 1985: 349). Di helbesta "Nezanîn"ê de jî diyar dike ku ji ber nezanînê Kurd ji huner, dewlemendî û nasîna dîroka bavûkalan bêpar mane û welatê wan jî wêran bûye (Rehmî, 758). Lewra di medreseyên Kurdan de ji bilî serf û nehwê tu zanistên din nehatine xwendin û ji ber vê jî Kurd ketine rewşeke sefîl û perîşan. Weha diyar e, helbestvan di navbera bindestiya Kurdan û nezanînê de peywendiyeke rasterast dibîne, loma jî di helbesta "Gaziya Dûmahîkê de ji bo rizgariya Kurdan ji dîlî û xulamtiyê tekane çare îlm û îrfanê destnîşan dike (Rehmî, 977) û vê ne tenê ji bo mêran ji bo jinan jî pêwîst dizane (Rehmî, 942). Ji ber vê helbestvan ji nifşên ciwan dixwaze ku bi riya îlm û fen û hunerê welat vejînin û ji dewlemendên Kurd jî dixwaze ku "mektebên seadetê" vekin û bi vî awayî di danîna bingeha pêşketina welatê xwe de beşdarî bikin (Rehmî, 408-409).

Wek helbestvanekî Silêmaniyê di helbestên Şêx Nûrî de jî karîgeriya komeleyên Kurdî û netewetiya modernxwaz diyar dibe, loma jî helbestvan di helbestên xwe de bi girîngî behsa damezirandina komeleyên Kurdî û derxistina kovar û rojnameyan bi zimanê Kurdî dike. Ji ber vê bi boneya vekirina "Yaney Serkewtin"ê û damezirandina "Komeley Zanistî"yê bi navê "Yaney Serkewtin" û "Bo Ahengî Komeley Zanistî Kurdan" du helbest dinivîse. Dîsa wek nîşaneya girîngîdana bi kovar û rojnameyên vê serdemê bi boneya derketina rojnameya *Jiyan*ê û kovara *Gelawêj*ê jî

du helbest dinivîse. Şêx Nûrî ji bo pêşvebirina milet û welat zanînê pêwîst dizane, lewra bi dîtina wî bi wasiteya zanînê mirovahî gihîştiye asta firînê û navên kesayetên mîna Kolomb û Wasqo bi bîr tîne ku ji ber zanîna wan navê wan hertim zindî maye (Şêx Salih, 2008: 502). Ji bo vê jî helbestvan girîngiyeke mezin dide vekirina xwendingehan û di wê baweriyê de ye ku xwendingeh di vê serdemê can didin mirovan û paşeroja miletan ronî dikin (Şêx Salih, 506). Bi vî awayî helbestvan ji bo pêşvebirin û modernkirina civata Kurdî xwendingehên ku bingeha zanistên nû û cihê perwerdekirina nifşên paşerojê ne girîng dibîne û serketina neteweya Kurd bi fêrbûna zanistên nû û vekirina xwendingehan ve girê dide.

Herwek helbestvanên berî xwe Bêkes jî behsa damezirandina "Komeley Zanistî" û "Yaney Serkewtin"ê dike mijara helbestên xwe û di helbesta xwe ya "Qutabxaney Zanistî" de diyar dike ku mebesta "Zanistî"yê belavkirina îlm û xwendin, pêşvebirin û xizmetkirina qewmê Kurd e, loma jî hebûna "Zanistî"yê welat bilind dike û wî ji dûdilî û nexweşiyan rizgar dike. (Bêkes, 1391: 218) Di helbesta "Yaney Serkewtin"ê de jî helbestvan vê dezgehê wek rêberê îlm û pêşketinê dibîne ku dê hewl bide nezanî, zordarî û wehşetê ji nav Kurdan rake. Ji ber vê jî bi dîtina wî "Yaney Serkewtin" ji bo Kurdan cihê şanaziyê ye û divê bibe ziyaretgeha hemû Kurdan (Bêkes, 147). Bêkes bi boneya bîst saliya derketina rojnameya *Jîn*ê jî di helbesteke xwe de kêfxweşiya xwe derdibire û diyar dike ku *Jîn* bûye sedama hişyarî û pêşketina Kurdan û hêvî dike *Jîn* û emsalên wê di nav Kurdan de zêde bibin da ku bibin hokarên hişyarî û pêşketinê (Bêkes, 88-89).

Bêkes li ser şopa pêşiyên xwe îlm û hunerê ji bo serkeftina miletê Kurd pêwîst dibîne û miletên bê îlm û huner di bin piyên biyaniyan de mehkûmî gevizandin û bendetiyê dibîne (Bêkes, 1391: 71,87). Lewra helbestvan di sedsala bîstem de bê îlm û huner pêşketina neteweyan mehal dibîne, loma jî bi dîtina wî eger Kurd tênekoşin dê halê wan xirabtir bibe û dê negihîjin tu armanceke xwe (Bêkes, 84). Ew jî merhem û dermanê Kurdan di xwendingehê de dibîne ku tê de çiraya zanistê tê vêxistin (Bêkes, 146). Bêkes di pêşvebirina Kurdan û modernkirina civata Kurdî de bal dikêşe ser bîrhişkiya şêx û melayên Kurd ku bi awayekî famkorane li pêşiya neteweya Kurd dibin asteng û nahêlin Kurd bi riya fenên nû pêşkevin. Helbestvan ji ber ku ji şêx û melayan bêhêvî dibe wan dişibîne zilamên dînî yên xirîstiyaniyê ku bi dîtina wî heta Ewrûpayê dawî li hukmên wan neanî, nekarîn pêşkevin, loma jî ji Xwedê dixwaze ku Martin Lutherekî ji bo gelê Kurd jî bişîne da ku wan ji destê van şêx û melayan rizgar bike. "Xwaye yek Lûter binere bo gelî Kurdî feqîr / Ba necatî da le jêr destî mela û şêxan û pîr" (Bêkes, 138-139) Bi vî awayî Bêkes wek helbestvanekî neteweyî yê modern ji bo gihîştina armancên neteweyî moderniyê wek pêşmerc datîne û van her du diyardeyan bi hev ve girê dide.

Zêwer jî wek nerîteke vê serdemê di helbestên xwe de pesnê kovar û rojnameyên mîna *Gelawêj, Rojî Kurd* û *Bangî Kurdistan*ê dide û ji bo pêşketin, hişyarî û xwendewariyê hebûna kovar û rojnameyan girîng dibîne. Zêwer nezaniyê wek bendeke li hember jiyanê dibîne û îlm û edebê jî wek dermanê vê nexweşiyê destnîşan dike. Ew jî di wê baweriyê de ye ku zanist qewmekî hejar bilind dike û paşeroja wî dabîn dike, loma jî ji dewlemendên welat hêvî dike ku xwendingehan ava bikin (Zêwer, 2008: 111-112) û ji dayk û bavan jî dixwaze ku keç û kurên xwe bişînin xwendingehan da ku bi riya îlm û edebê xizmeta welatê xwe bikin (Zêwer, 243).

Ji van mînakan derdikeve ku helbestvanên Kurd ên vê serdemê, di nebûna dewleteke Kurdî de komeleyên Kurdî wek dezgehên neteweyî derdixin pêş û bi wasiteya wan dixwazin armancên neteweyî pêk bînin. Li aliyê din vekirina xwendingehan û derxistina kovar û rojnameyan jî ji bo pêşvebirina ziman, edebiyat û hişyariya neteweyî karekî pêwîst dizanin û xelkê Kurd ji bo vê han didin. Di gotara helbestvanên vê serdemê xwendin û zanistên modern wek nîşaneya karîgeriya pozîtîvîzmê ji bo gihîştina armancên neteweyî dibin tekane riya çareyê û Ewrûpa jî ji ber ku navenda vê zanista nû ye dibe pîvana modernî û pêşketina neteweyî û qîblegeha netewetiya modernxwaz a Kurdî. Ji ber vê jî helbestvanên Kurd ji bo gihîştina armancên neteweyî hizra moderniya ewrûpayî di nav Kurdan de belav dikin û di gotara wan de modernî û netewetî wek du regezên temamkerên hev derdikevin pêş. Ji ber vê helbestvanên Kurd ên vê serdemê bi çavekî romantîkane li xwendin û pêşketinê dinêrin û weha dibînin ku dema xwendewariyeke modern li welat bê piyadekirin dê hemû kêşeyên neteweyî bên çareserkirin û neteweya Kurd bigihîje kenarê aramiyê.

## 5. PEYDABÛNA NETEWETIYA ÇEPREW Û RENGVEDANA WÊ DI HELBESTA KURDÎ YA NÛ DE

Şoreşa Bolşevîk ne tenê li Rûsyayê, karîgerî li tevahiya cîhanê çê dike û bi avakirina Sovyetê di navbera her du cemserên komunîst û kapîtalîst de rikeberiyeke tund rû dide. Ji ber vê Sovyet dixwaze şoreşa proleteryayê li hemû cîhanê belav bike û bi riya îdeolojiya xwe ya çînî karîgerî li ser welatên din jî çê bike. Bê vê armancê, bi riya rêxistinên nihênî û partiyên komunîst hewl dide pêgeha xwe di nav sînorên siyasî yên dewletên serdest ên li Kurdistanê de jî xurt bike da ku sîstema xwe di nav van welatan de jî bi ser bixe. Ji ber ku dewletên serdest ên li Kurdistanê bi tevahî di bereya kapîtalîst de ne, Kurd bi awayekî siruştî dikevin bin karîgeriya propagandaya siyaseta Sovyetê û di nav çîna xwendewar a Kurdî de îdeolojiya marksîst bihêz dibe. Loma jî di dawiya salên sihî de çendîn rêxistin û partiyên Kurdî yên marksîst tên damezirandin û di jiyana siyasî û ronakbîriya Kurdî de serdemeke nû dest pê dike.

Li gor ragihandina Chris Kutschera yekem rêxistina çeprew a Kurdî di sala 1938an de bi navê Rêxistina Darker li Kurdistana Îraqê tê damezirandin (Kutschera, 2001: 163). Piştî vê li Kurdistana Îranê di sala 1939an de Partiya Azadîxwaz a Kurdistanê, li Bexdadê di 1941ê de Partiya Hîwayê û dîsan li Kurdistana Îranê di 1942an de Komeley Jiyanewe (J.K) tên damezirandin. Wek taybetmendiya giştî ya vê serdemê bernameya rêxistin û partiyên siyasî yên Kurdî ji aliyekî ve neteweyî ye û xweserî û mafên rewa yên Kurdan ji xwe re dike armanc, ji aliyê din ve jî di bin karîgeriya îdeolojiya çeprew de li dijî bereya emperyalîst û hevkarên wê tê darijtin.

Di rastiyê de marksîzm wek îdeolojiyeke çînî li dijî îdeolojiya neteweyî radiweste û li gor ragihandina Gellner Manîfestoya Komunîst li hember Friedrich Listê berdevkê neteweperweriya almanî tê nivîsîn. Ji ber vê ev manîfesto di heman demê de manîfestoyeke dijî netewetiyê ye. Lewra li gor Marx, neteweya karker ked, hukumeta wî sermiyan û hewaya welatê wî jî hewaya kargehê ye (Gellner, 2013b: 32-33). Bi dîtina Marks nakokiya rasteqîne ya mirovahiyê; ne nakokiya neteweyî ye, nakokiya çînî ye. Ji ber vê jî netewetiyê wek navnîşaneke şaş dide zanîn (Gellner, 2013b: 223).

Stalîn jî herwek têgihîştina hevbeş a marksîstan ji ber ku netewetiyê wek îdeolojiya burjuvaziyê li qelem dide, di wê baweriyê de ye ku tevger û dewletên neteweyî hertim di bin kontrola burjuvayê de ne û xizmeta berjewendiyên vê çînê dikin. Loma jî netewetiyê wek amraza serkutkirina proleteryayê dide zanîn û propagandaya neteweyî jî ji bo veşartina berjewendiyên çînî yên proleteryayê û ji bo kolekirina hişmendiya proleteran wek zemîneke xeternak li qelem dide (Lenîn-Stalîn, 2014: 23).

Marks û peyrewên wî herçend netewetiyê wek navnîşaneke şaş nîşan dabin jî pêşhatên cîhanê li gor pêşbîniyên wan dernakevin û nakokiyên neteweyî hertim dikevin pêşiya nakokiyên çînî. Lewra cengên mezin ên ku neteweyên ciyawaz tînin hember hev û îdeolojiya kolonyal û emperyal hêz didin nasnameyên neteweyî û netewetî wek normeke siyasî her ku diçe bihêztir dibe. Di rewşeke weha de Lenîn ji bo gihîştina civateke bêçîn di rêberiya dîktatoriya proleteryayê de rizgarî û azadiya neteweyên bindest pêwîst dizane (Lenîn-Stalîn, 2014: 77) û rê li ber alîgiriya netewetiya bindest vedike. Ji ber vê jî bi dîtina Hobsbawm, di pêvajoya Cenga Cîhanê ya Duyem de û bi taybetî piştî 1941ê komunîst li welatparêziyê xwedî derdikevin û cureyek ji cureyan rewabûnekê didin berxwedanên neteweyî. Ji ber vê jî di maweya şer de alayên sor û alayên neteweyî digel hev tên hildan (Hobsbawm, 2010: 174) û ev dibe sedem ku di navbera tevgerên neteweyî yên serxwebûnxwaz û bereya dij emperyal a komunîst de hevgirtinekê çê bibe. Di encama vê de ew dewletên nû yên ku li dijî kolonyalîzmê tên avakirin û ne sosyalîst in xwe wek dewletên “sosyalîst” radigihînin û “rizgariya neteweyî” jî dibe diruşma sosyalîzmê (Hobsbawm, 2010, 178).

Di zemîneke weha de tevgerên siyasî yên Kurdî bi awayekî siruştî xwe di bereya komunîst de dibînin û di navbera netewetiya Kurdî û îdeolojiya marksîst de pevgirêdanekê çê dikin. Bêguman di avakirina gotara nû ya neteweyî de helbestvan wek endam û alîgirên van rêxistinên siyasî roleke çalak digêrin û netewetiya Kurdî di çarçoveya îdeolojiya nû de jinûve pênase dikin. Ji ber vê jî gotara netewetiya çeprew di navbera salên çilî û şêstî de gelek serdest dibe û hema bibêje piraniya helbestvanên vê serdemê bi awayekî çalak di avakirina vê gotarê de beşdarî dikin. Lewra ji ber yekbûna dijminên neteweyî û bereya komunîst di gotara helbestvanên neteweperwer ên çeprew de hevgirtina gotara neteweyî û marksîst bi asanî cihê xwe digire û bê dudilî dijayetiya serdestên neteweya Kurd û dijminên bereya komunîst tê kirin. Ji bo nîşandana vê diyardeya nû em dê berê xwe bidin helbestên Goran, Cegerxwîn, Qani', Dildar, Hejar û Qedrî Can ku wek pêşengên vê gotara nû derdikevin pêş di helbesta Kurdî de.

Her di vê çarçoveyê de Goran di helbesteke xwe de zordariya li ser Kurdên başûr ji aliyê dewleta Îraqê ve wek "çerçîtiya îstî'mar"ê bi nav dike û diyar dike ku ji bo Kurdekî gotina navê Kurdistanê ji aliyê van çerçiyan ve wek kufrê tê dîtin û Kurd di bin destê çerçiyên kolonyalîst de hatine zincîrkirin (Goran, 1389: 168). Ji ber vê, helbestvan "îstî'mara xwînmij" bi "kurdkujî" û "hejarkujiyê" tawanbar dike û têkoşîna li hember vî dijminê xwînwar pêwîst dizane (Goran, 307). Goran her di çarçoveya hevgirtina gotara neteweyî û çeprew de diyar dike ku eger bereya komunîst serkeve û bereya emperyalîst û nokerên wê bişkin, dê Kurdistan bi her awayî avadan bibe û bibe bihiştek dinyayî. Bi dîtina wî dema xortên Kurd alaya komunîstiyê bi ser asîmanê welat de hilkin dê avên çeman bo ser çiyayên Kurdistanê bên kişandin, her der bi bax û baxçeyan bê xemilandin, li gelî û deştên welat avahiyên xweşik bên lêkirin, bi traktoran zevî bên cotkirin, embarên welat bi genim bên tijîkirin û ji ber ku êdî dê samanên siruştî yên welat neyên dizîn dê bêrîka xelkê bi pereyan tijî bibe. Loma jî dê seranserê Kurdistanê bibe gencîne, di baxçeyên welat de gulên nû bipişkivin, bilbil xwe fêrî awazên nû bikin û zarokên welat di landika xwe de girînê ji bîr bikin (Goran, 195). Helbestvan ji bo selmandina vê pêşbîniya xwe di helbesta "Rêgay Lenîn" de Azarbaycanê wek mînak nîşanî Kurdan dide ku bi saya Lenîn û şoreşê pêşketiye. (Goran, 227) Goran ji bilî hêviya welatekî avadan û dewlemend, ji aliyê siyasî ve jî îdeolojiya çeprew di xêra Kurdan de dizane. Bi dîtina wî Kurd dikarin bi riya komunîzmê xwe bi cîhanê bidin qebûlkirin, loma jî ji xortên Kurd dixwaze ku di nav desteya xortên komunîst de behsa doza gelê xwe bikin. Lewra bi saya "roja Marks û Lenîn şefeqekê di asoya mirovahiyê de xwe nîşan daye ku ciyawazî naxe navbera gelên biçûk û mezin" (Goran, 194). Bi vî awayî di navbera îdeolojiya komunîst û pêşvebirina Kurdan de pevgirêdanekê çê dike û van boçûnên xwe wek modeleke neteweperweriya çeprew pêşkeş dike.

Hejar di helbestên xwe de li dijî emperyalîzma Îngilîz û amerîkayî piştgirî dide bereya komunîst û ji ber ku bereya komunîst di pêşengiya Sovyetê de piştevaniya gelên çewisandî dike, pêwîst dizane ku hemû gelên aştîxwaz di bin alaya komunîzmê de kom bibin (Hejar, 1391: 17). Helbestvan ji bo nîşandana hevgirtina armancên netewetiya Kurdî û bereya komunîst behsa rûxandina Komara Kurdistanê û bidarvekirina Qazî Mihemed dike. Ji bo berçavkirina vê rûdanê diyar dike ku dema li Çarçirayê sêdare tê danîn du amerîkayî û Îngilîzek digel çend Eceman tên wir û zilamê amerîkayî nivîsekê derdixe û di meydanê de dixwîne. Di nivîsa xwe de diyar dike ku hemû cîhan milkê Amerîkayê û hevkarên wê ye û mirovên din jî tenê wek nokerên wan dikarin bijîn. Kî dawa maf û nîştimanperweriyê bike dê bê jinavbirin û ji ber ku kurdan û azeriyan xwe xwedan mal zanîne û guhê xwe nedane şîretên Amerîkayê dê bên bidarvekirin (Hejar, 78-79). Bi vî awayî Hejar çewisandina neteweya Kurd bi siyaseta emperyalîzmê ve girê dide û piştgiriya bereya komunîst wek erkekî mirovî û neteweyî nîşan dide.

Her di vê çarçoveyê de Hejar ji ber ku dijminê neteweya Kurd dijminê bereya komunîst jî dizane ji wan dixwaze ku piştgirî bidin Kurdan û wan ji bin desthilatdariya Tirk, Fars û Ereban rizgar bikin. Helbestvan di helbesta "Namey bo Warşew" de diyar dike ku Kurdistan di bin dagirkeriya Tirk Ecem û Ereban de ye û her yek ji wan bi awayekî zordarî li Kurdan dike. Ji bo nîşandana zordariya van sê dewletan jî serkutkirina Komara Kurdistanê, serhildana Çiyayê Agiriyê û serhildana Barzan û Berderkê Serayê li Silêmaniyê mînak dide û diyar dike ji ber ku Kurd jî digel bereya komunîst hevmebest in, pêwîst e cîhana komunîst piştgirî bide Kurdan (Hejar, 1391: 31-32). Lewra helbestvan herwekî di helbesta "Peyam bo Mawmaw" de jî hatiye çarenûsa Kurdan û gelên bereya komunîst yek dibîne û şehîdên Nayrobî û Mahabadê jî şehîdên destên heman dijminî dide zanîn (Hejar, 35).

Di têkelkirina gotara komunîst û neteweyî de belkî jî helbestvanê herî navdar Cegerxwîn e. Helbestvan di gelek helbestên xwe de behsa vê diyardeyê dike û li hember bereya emperyalîst nîvê cîhanê birayê Kurdan dide zanîn û (Cigerxwîn, 1992: 303) herwekî Goran û Hejar dijminê neteweya Kurd û dijminê komunîzmê yek dibîne. Di helbesta xwe ya navdar "Kî Me Ez"ê de dema li ser navê Kurdan diaxive, dijminê Kurdan wek "dijminekî xwînxwar, xurt û koledar" nîşan dide. (Cegerxwîn, 2003: 13) Loma jî berxwedana neteweyî ya Kurdan a li hember vî dijmînî bi "rêçika Markîs" û bi "rêçika Lenîn" mumkîn dibîne (Cegerxwîn, 2003: 19). Helbestvan kurdewariya bê marksîzmê kêm dizane û ji Kurdan dixwaze "nebêjin tenê kurdewarî bes e" lewra rizgarî bi riya marksîzmê dikare pêk bê (Cigerxwîn, 1997: 140), lê marksîstiya helbestvan markîstiyeke welatperwer e. Loma jî ji "markisî" û "norsî"yên welatperwer dixwaze ku di nav tifaqê de welatê xwe ava bikin û bi hev re têbikoşin (Cigerxwîn, 1997: 226). Cegerxwîn dema di nav marksîstî û kurdbûnê de dimîne kurdbûna xwe dide pêş û marksîstiyê wek nasnameyeke duyem dipejirîne.

Di helbesteke xwe de diyar dike ku herçend wek marksîstekî enternasyonal piştgirî bide proleterên Efrîqa û Ewrûpayê û xwe wek şoreşgerekî Kûbayî, Vîyetnamî û Engolayî jî bibîne, "berî her tiştî" Kurd e (Cigerxwîn, 2000: 36).

Qedrî Can jî emperyalîzmê wek piştevanê dijminê Kurdan dibîne û rengeke marksîstî dide gotara xwe ya neteweyî. Di wê helbesta xwe de ku bi boneya şîna Pêşewa Qazî Mihemed nivîsiye, diyar dike ku Conpolê Îngilîz ji esrarkêşên Ecem re lîstikeke weha amade dike ku Komara Kurdistanê û Pêşewa Qazî Mihemed bi destê wan tê jinavbirin herweha Tiromanê serokê Amerîkayê jî wek "bênamûs û teresekî" bi nav dike ku bi balafirên xwe Azerbeycan û Kurdistanê bombebaran dike û zar û zêçên bêguneh dide kuştin. Bi dîtina helbestvan, "Ecemên esrarkêş" û "turkên tûranî" bi piştgiriya Îngiltere û Amerîkayê bi tang û top û balafirên xwe ve bi ser Kurdan de tên û wan dikujin, lê helbestvan di wê baweriyê de ye ku kurdayetî dê her bijî û rojek ji rojan dê bi ser keve (Qedrî Can, 2009: 122). Bi vî awayî Qedrî Can jî li hember dijminên hevbeş kurdîtî û marksîstiyê di yek xelekê de dinirxîne û bi gotara netewetiya çeprew derdikeve pêş.

Helbestvanên neteweperwer ên çeprew di bin karîgeriya îdeolojiya marksîst de pêkhateya neteweyî ya Kurdî jinûve pênase dikin û di nav pêkhateya neteweyî de cih nadin sermayedar, beg, axa, şêx û melayan. Lewra marksîzm van kes û çînên navborî wek hevkarê emperyalîzmê dizane û di nav sîstema xwe de cih nade wan. Di vê çarçoveyê de Stalîn diyar dike ku eger neteweyek bi rêberiya beg û melayan mafê xwe yê cudabûnê yan jî xweseriyê bi kar bîne ev dê di berjewendiya çîna xebatkar de nebe (Lenîn-Stalîn, 2014: 26) û li dijî prensîbên marksîzmê be. Ev kes wek endamên çîna serdest ji ber ku zordariyê li çîna karker û cotkar dikin dijminê çîna proleter in û di heman demê de dijminê marksîzmê ne.

Helbestvanên Kurd jî ji ber ku van kesan wek nokerên dewletên serdest ên li Kurdistanê û dewletên serdest jî wek hevkarê emperyalîzmê pênase dikin, van kesan hem wek dijminê neteweya Kurd û hem jî wek dijminê bereya komunîst li qelem didin. Loma jî helbestvanên neteweperwer ên çeprew van çîn û kesayetên navborî ji xaneya kurdbûnê derdixin, wan dikin bereya dijminê hevbeş ê kurdayetî û marksîzmê û bi vî awayî di nav îdeolojiya neteweyî û marksîst de hevgirtinekê çê dikin. Loma jî di gotara helbestvanên neteweperwer ên çeprew de Kurd tenê ji çîna karker, hejar û ji dijminên emperyalîzmê pêk tên. Di vir de kirasê teng ê çînayetiyê li bejna pêkhateya berfireh a netewetiyê tê liberkirin û naveroka neteweyê li gor îdeolojiya marksîzmê tê dagirtin, di beramberî vê de jî piştgiriya bereya komunîst ji bo neteweyê tê dabînkirin û bi vî awayî zemîneke rewa ya netewetiyê di çarçoveya îdelojiya marksîst de tê peydakirin.

Qaniʿ her di vê çarçoveyê de ji bo rewa nîşandana şoreşa çînî, reşkirina hevkarên emperyalîzmê û nokerê dijminên Kurdan, pêşî bal dikêşe ser jiyana hejar û

nedaran û diyar dike ku cotkarên vî welatî dûçarî xemê bûne û ketine nav gerîneka hejarî û zordariya axa û maldaran. Lewra axa bi hevkariya têhna rojê xwîna hejar û bêkesan vedixwin. Di demeke ku hejar û bêkes di nav nexweşiyê de ne, axa di koşkên xwe de mijûlî aheng û xwarinê ne. Digel ku rencber di nav mij û morana bextreşiyê de noq bûne dîwanên axa û mîran bi pere û keda wan tên xemilandin (Qaniʿ, 1391: 290-291). Helbestvan diyar dike ku di vê rewşê de çîna bindest bê mal û nan birçî û tazî digere, lê çîna serdest di nav telar û koşk û dikanên xwe de li ser keda wan kêfa xwe dikin (Qaniʿ, 298). Ji ber vê bi dîtina Qaniʿ di vê cîhana bêdad de ji bilî mirinê tu tiştekî bi para hejaran nakeve, eger dewlemend di jiyana xwe de carekê bimirin hejar her sibeh û êvarekê jinûve dimirin. “Dewllemend emrê emma yek car e / Mirdinî hejar, subh û êware” (Qaniʿ, 524).

Bi dîtina Qaniʿ endamên çîna serdest ne tenê zordariyê li ser hejar û karkeran dikin di heman demê de nokeriya emperyalîzmê jî dikin û heta ev kes nûnertiya Kurdan bikin dê Kurd rizgar nebin (Qaniʿ, 1391: 458). Ji ber vê Qaniʿ hejar û bindestan han dide da ku li hember çîna serdest serî hildin û wan ji nav bibin. Bi dîtina wî divê cotkar, rencber, şivan û ronakbîr pêkve dest bavêjin çek û qelemê, vê nîzama riziyayî hilweşînin û di şûna wê de nîzama wekheviya jiyanê daynin. Di vê serhildanê de divê beg, axa, mîr, xan, sermayedar û hemû noker yan bên qewirandin yan jî bên bidarvekirin (Qaniʿ, 209). Dema welat ji wan rizgar bibe divê mal û milkê ku ji wan mane bi mîzana edaletê di nav xelkê de bên parvekirin (Qaniʿ, 205) û jin û zilam û pîr û ciwan mil bi mil welatê xwe jinûve ava bikin. Bi vî awayî dê proleterên Kurd bibin rêberên Kurdistanê (Qaniʿ, 210) û şoreşa çînî û neteweyî bi ser keve.

Goran piraniya şêx û melayan casûsê dijminê Kurdan û axayan jî wek “kesên bênamûs” dide zanîn. Ji ber vê, bi dîtina wî gelek zilamên mezin û navdar hene ku herwekî laşê hejaran ruhê wan di nav gemariyê de ye (Goran, 1389: 169). Goran axa û derebegan bi emperyalîstiyê tawanbar dike, lewra ev kesên zordar bi şev û roj xortên Kurdan bê nan û cil didin xebitandin, roja wan bi çewisandinê û şevên wan jî bi nalînê diherimînin (Goran, 193).

Di çîroka helbestî ya “Lale Bas” de Dildar behsa zordariya keyayekî bi navê Kak Sûr dike ku Kak Sûrê keya ji bo dest dayne ser milkê xelkê pêşniyaza şahidiya derewîn li Lale Bas dike, lê dema Lale Bas vê qebûl nake pêşî mala wî dide ber guleyan û paşê jî talan dike. Piştî demekê vê carê Salih Axa dest datîne ser malê wî yê tapûkirî. Dema ku Lale Bas razî nabe tapûyê xwe bide ser wî, axa jê re dibêje yan tapû bide yan jî mala xwe bar bike û here. Axa mala wî dide ser pişta çend hespan û di ser de jî ji bo Resûlê kurê wî bişînin esker diçe giliya wî bi dewletê dike. Lale Bas ji bo ku kurê wî neşînin eskeriyê diçe cem zabitê Koyeyê, lê ew jî dawa pereyan lê dike (Dildar, 1985: 211-213). Bi vî awayî Dildar dixwaze nîşan bide ku çîna serdest

a Kurd û nûnerê dewleta serdest pêkve zordariyê li ser Kurdan dikin û ew jî her di çarçoveya têgihîştina netewetiya çeprew de çîna serdest a Kurd wek hevkarê sîstema emperyalîst nîşan dide û wan ji bazineya kurdayetiyê derdixe.

Di helbestên Cegerxwîn de jî axa, beg û sermayedar bi kuştin û xwînxwarî hukum li ser çîna cotyar û karker dikin. Şêx, beg, axa û sermayedar dest datînin ser berê destê rencberan û ew bixwe jî bê ku bi serma û germa jiyanê bihesin di bircên xwe yên belek de di nav rehetiyê de dijîn (Cigerxwîn, 1992: 411). Ji ber vê Cegerxwîn tekyayên şêxan wek cihê xapandina xelkê û xaniyên axayan jî wek hêlîn û lîsa dizan bi nav dike. (Cigerxwîn, 1992: 45) Bi dîtina wî, ev hezar sal in, şêx û axa hevkarê dijminê Kurdan in û digel wan pêkve mal û milkê Kurdên reben û hejar dixwin (Cigerxwîn, 1992: 317). Di vê rewşê de Kurd rencberê beg û axayan in û ew jî rencberê dijminê Kurd in (Cigerxwîn, 1992: 306). Helbestvan şêx, beg û axayan dişibîne "tabûra pêncan" ku wek sîxûrê navxweyî ji bo dijmin kar dikin (Cigerxwîn, 1992: 407). Ji ber vê Cegerxwîn şêx û axayan kurdperwer qebûl nake (Cigerxwîn, 1997: 145), wan ji xaneya kurdbûnê derdixe û wek dijmin destnîşan dike (Cigerxwîn, 1992: 321). Bi vî awayî Cegerxwîn jî Kurdan bi çîna hejar û bindestan ve sînordar dike û sînorên marksîzm û kurdayetiyê dike yek.

Ji ber ku di gotara neteweyî ya helbestvanên çeprew de pênaseya neteweyê diguhere, pênaseya dijminên Kurdan jî diguhere. Di vê çarçoveyê de çîna proleter û alîgirên bereya komunîst ên Tirk, Fars û Ereb ji xaneya dijminatiyê tên derxistin wek dost û hevkarê Kurdan tên destnîşankirin. Ji ber vê di çarçoveya biratiya îdeolojîk de dijminên neteweyî jinûve tên pênasekirin û pîvana "em" û "dijmin" ji diyardeyeke etnîk û çandî wêdetir dibe diyardeyeke îdeolojîk û siyasî. Bi taybetî di 14ê Tîrmeha 1958an de dema ku ji aliyê Ebdulkerîm Qasim ve kudetayeke eskerî tê kirin û alîgirên bereya komunîst tên ser hukum ji aliyê helbestvanên Kurd ve ev rûdan bi kêfxweşî tê pêşwazîkirin û dibe sedem ku cext li ser biratiya îdeolojîk bikin.

Goran ji xortên Kurd dixwaze ku destên xwe bidin destê birayên xwe yên Ereb û di metropolên mezin ên cîhana komunîst de dawa mafê Kurdan bikin (Goran, 1389: 192). Piştî kudetaya 1958an Goran ji bo diyarkirina kêfxweşiya xwe li hember serkeftina alîgirên bereya komunîst, Kurd û Ereban wek du piyên gelê Îraqê nîşan dide û bi îraqîbûna xwe şanazî dike (Goran, 1389: 216). Di bin karîgeriya hewaya erênî ya şoreşa çeprew a 1958an de ew çend hêviyên Goran zêde dibin ku di helbesteke xwe de bang li Bêkesê rehmetî dike û diyar dike ku xwezî li jiyanê bûya û bidîta Erebên bira ji bo edebiyata Kurdî çend dilsoz in û çend qîmetê didin helbestên wî (Goran, 252). Bi vî awayî di wê baweriyê de ye ku bi hatina desthilata Erebên marksîst Kurd gihîştine mafê xwe û di şûna nakokiyên neteweyî de biratiya îdeojîk a gelan cih girtiye.

Hejar li hember emperyalîzmê di helbesta "Şoriş Ekem" de behsa biratiya îdeolojîk a Tirk, Ereb, Fars û Kurdan dike û diyar dike dema ev netewe dest bidin hev dê koka emperyalîzmê bînin (Hejar, 1391: 49). Wê demê ev netewe dê serbixwe bibin û gelê Kurd jî di bîranîna Şoreşa Oktobirê de li çiyayên Kurdistanê cejn bike (Hejar, 89). Cegerxwîn jî bi heman awayî Kurd û Eceman bira dizane û koledaran wek dijminê hevbeş dide zanîn, lê di vir de ji ber ku alîgirê cîhana emperyalîst in serokwezîrê Îraqê Nûrî Seîd û serokomarê Tirkiyeyê Celal Bayar wek dijmin dide zanîn (Cigerxwîn, 1992: 332). Qedrî Can bi gotina "birader"a Farisî, "ixwan"a Erebî û "yoldaş"a Tirkî bang li endamên sê neteweyên serdest ên Kurdistanê dike û bi vê şîfreya biratiya îdeolojîk tîne bîra wan ku dijminên wan ên hevbeş Amerîka û Îngiltere ne (Qedrî Can, 2009: 120). Qedrî Can jî şoreşa 1958an bi kêfxweşî pêşwazî dike û wek nimûneya hukumraniyeke çep komara Îraqê dişibîne stêrkeke ronak ku bi ronahiya xwe Fars û Tirk û Kurd û Ereb kirine bira û ji bo kesên azadîxwaz bûye mizgînî (Qedrî Can, 135).

Aşkera ye helbestvanên Kurd ên vê serdemê çarenûsa neteweya Kurd bi serketina cîhana komunîst ve girê dane û îman bi biratiya îdeolojiya marksîst anîne ku bi serketina şoreşa komunîst dê Kurd bigihîjin mafê xwe û kêşeya wan a çînî û neteweyî bi hev re bê çareserkirin. Ji ber vê, helbestvanên vê serdemê bi hesteke romantîkane behsa Sovyetê, Moskovayê û serkirdeyên wê yên mîna Lenîn û Stalîn dikin. Loma jî bi boneya festîvalan çûna Moskovayê di gotara helbestvanên Kurd de vediguhere rîtuela heceke îdeolojîk. Bi taybetî li ser zimanê Goran û Qedrî Can Moskova dibe bihişt, xelkê wê dibin bihiştî û çûna li wir dibe heceke îdeolojîk.

Goran di helbesta xwe ya "Moskoy Ciwan" de bajarê Moskovayê dişibîne jineke rind a cilspî ku ji nav devê wê yê sor stranên xweş diherikin û Moskova bi awaz û orkestraya xwe helbestvan di nav pêlên helbestî de mest dike. Helbestvan Moskovaya ku dişibîne keça mezin a şoreşa Oktobirê bi metro û Meydana Sor, gulên Parka Gorkî û zarokên dêm sor bi bîr tîne. Bi dîtina wî çawa ku Mem nikare Zînê ji bîr bike ew jî tu carî nikare Moskovayê ji bîr bike (Goran, 1389: 226). Lewra diruşmên aştiyê yên ku ji Meydana Sor bilind dibin mizgîna jiyaneke xweş didin helbestvan û xelkê bihiştî yê Moskovayê jî dibin sedem ku Goran di bin alayên sor û kesk de xewna rizgariya gelê xwe bibîne (Goran, 239-240).

Qedrî Can bi helbesta xwe ya "Ez Diçim Mosko"yê çûna Moskovayê wek rîtueleke hecê berçav dike. Lewra helbestvan diyar dike ku zahidek bi kîjan hest û coş biçe hecê, dildarek bi evîneke çawa berê xwe bide yara xwe û zarokek çawa xwe bavêje himbêza dayka xwe ew jî weha berê xwe dide Moskovayê. Ji bo îmaja hecê bihêztir bike diyar dike ku berî ku biçe Moskovayê her sê zarokên wî dora wî digirin û jê diyariyên Moskovayê dixwazin herweha dema rêwîtiyê de digel wî di keştiyê de ji Ereb, çerkes, Kurd û Ermenan pênc sed mirov hene û hemû jî bi yek dil û yek

zimanî bi stran û govend û dîlanê berê xwe didin Moskovayê. Li Ewdîsayê kom bi kom mirov li hev dicivin hev hemêz dikin, ji çavên wan hêsirên kêfxweşî û dilgeşiyê diherikin. Helbestvan dema digihîje Moskovayê mirovên wan wek melekan dilsaf, devbiken, rûbiken û şa dibîne (Qedrî Can, 2009: 124-126). Bi vî awayî dixwaze nîşan bide ku Moskova wek navenda aştiya cîhanê bûye qîbleya hemû xelkên çewisandî û bindest û ji bo derdê neteweya Kurd jî tekane cihê çareseriyê ye.

Diyar e, marksîzm û netewetî herçend du îdeolojiyên dijber bin jî di serdema Sovyetê de ji ber berjwendiyên siyasî û hêza netewetiyê pêşengên komunîzmê ji neçarî netewetiyê wek netewetiya serdest û bindest ji hev cuda dikin û bi rewakirina netewetiya bindest rengeke marksîstî didin netewetiyê. Bi vî awayî li hember êrîşên cîhana emperyalist berxwedana neteweyî wek mertaleke bergiriyê li tenişt berxwedana çîna proleter bi cih dikin û di çarçoveya berjewendiyên du alî de marksîzm û netewetiyê li hev tînin. Ji ber vê jî di dawiya salên sihî de rêxistinên siyasî yên Kurdan û wek endamên wan ên çalak helbestvan jî dikevin bin karîgeriya vê boçûnê û di helbestên xwe de gotareke neteweyî ya nû ava dikin. Di vê gotarê de pênaseya neteweyê û dijmin di çarçoveya îdeolojiya marksîst de bê kirin jî kurdîtî û mafên Kurdan bi awayekî bihêz tên dupatkirin. Bi dîtina van helbestvanan bereya komunîst û bi taybetî Sovyet li hember dewletên serdest ên Kurdistanê ku hevkarê cîhana emperyalîst in, tekane hêz e ku dikare piştevaniya Kurdan bike û bi riya "îdeolojiya xwe ya dadperwerane" mafê Kurdan dabîn bike. Ji ber vê helbestvanên Kurd marksîstiya xwe di xêra kurdîtiyê de û kurdîtiya xwe jî di xêra marksîstiyê de têkelî hev dikin û gotareke nû ya neteweyî dadihênin. Di vê çarçoveyê de ji helbestvanên neteweperwer ên modernxwaz cudatir di gotara helbestvanên neteweperwer ên çeprew de di şûna "zanist û xwendinê" de "îdeolojiya komunîst" dibe rizgarkerê kurdayetiyê û di şûna "Ewrûpa"yê de jî "Moskoya ciwan" dibe qîbleya netewetiya Kurdî.

## 6. KURDAYETÎ Û RENGVEDANA WÊ DI HELBESTA KURDÎ YA NÛ DE

Di sala 1961ê de bi destpêkirina Şoreşa Eylûlê heta şikestina Peymana Cezayîrê ya 1975an netewetiya Kurdî bi navê kurdayetiyê derbasî qonaxeke nû dibe. Di vê serdemê de netewetiya Kurdî bi riya şoreşa çekdarî bi tevahî taybetmendiyeke şoreşgêrane û dijkolonyal werdigire. Bêguman ev di dîroka modern a Kurdan de yekem car nebû ku netewetiya Kurdî bi rêbazên çekdarî xwe nîşan dida. Lewra piştî ku Kurdistan di nav çar dewletên neteweyî de hat parvekirin, di parçeyên cuda cuda de wek karvedanekê li hember vê, serhildanên çekdarî hatin lidarxistin û ev bi gotina Michael Heacter li hember kolonyalîzmeke navxweyî, bû destpêka peydabûna netewetiyeke dijkolonyal (Özkırımlı, 2013: 118).

Bingeha kurdayetiyê berî Şoreşa Eylûlê di nav gelek serhildanên Kurdî de bi taybetî di serdema serhildanên Şêx Ubeydulah (1880), Şêx Mehmûd (1918-1930), Şêx Seîd (1925), Agirî (1927-1931) û damezirandina Komara Kurdistanê de li Mahabadê (1946) tê danîn û ev serhildan bi êş, tirajedî, qehremanî û berxwedana xwe dibin çavkaniya dahênana gotara neteweyî ya dijkolonyal. Lê digel vê yekê ev serhildanên navborî sînordar dimînin û nabin sedema hişyariyeke sertaserî ya piraniya xelkê Kurd. Şoreşa Eylûlê di serokatiya Mela Mistefa Barzanî de di nav van serhildanan de ya herî bihêz e ku bandor li ser parçeyên din ên Kurdistanê jî çê dike. Loma jî kurdayetî wek formeke taybet a netewetiya Kurdî di vê maweyê de li ser mîrata gotara neteweyî ya serhildanên navborî yên Kurdan tê dahênan û karîgerî li ser hemû Kurdên cîhanê çê dike.

Partiya Demokrat a Kurdistanê wek dezgeha siyasî ya îdeolojiya kurdayetiyê di destpêkê de di çarçoveya bernameya partiyên siyasî yên wê demê de li ser îdeolojiya netewetiya çeprew tê damezirandin û heta vegera Barzanî ya ji Sovyetê jî her di vê çarçoveyê de dimîne. Bi serkeftina şoreşa 14 Tîrmehê ya General Ebdulkerîm Qasim îdeolojiya netewetiya çeprew digihîje lûtkeya xwe, lê ev dirêj nakêşe. Lewra dema ku helwesta hukumeta Qasim li beramberî Kurdan diguhere, şer di navbera hêzên hukumetê û hêzên Kurdî de derdikeve û ev şer dibe sedem ku hêviyên biratiya îdeolojîk a Kurd û Ereban bişike. Di ser de jî dema ku Yekîtiya Sovyetê arîkariya çekan dide rejîma Îraqê, ji aliyekî ve birayên îdeolojîk ên berê dibin dijmin ji aliyê din ve jî Sovyeta ku wek dewleta rizgarker a neteweyên bindest dihat naskirin dibe piştevanê serdestên Kurdan. Ev dibin sedema wê yekê ku di pênaseya netewetiya Kurdî de guherîn çê bibe û ji aliyê Kurdan ve angajmana bereya komunîst ji holê rabe.

Di vê rewşê de pêşengên şoreşa Kurdî dema dibînin Sovyet piştevaniya Ebdulkerîm Qasim dike, ew jî di çarçoveya berjwendiyên neteweyî de peywendî bi Şahê Îranê û Amerîkayê re datînin û xwe nêzî bereya Rojava dikin. Ji ber vê bereya komunîst şoreşa Kurdî wek hevkarê emperyalîzmê li qelem dide û dijayetiya wê dike. Li ser vê di şerê 1974an de Yekîtiya Sovyetê, Almanyaya Rojhilat û Çekoslovakya wek welatên komunîst bi çek û pisporên xwe arîkariya dewleta Îraqê dikin û li dijî Kurdan radiwestin (Barzani: 2005: 334). Loma jî ev pêşhat arasteya netewetiya Kurdî diguherînin û şêweyek ji şêweyan di pênaseya kurdayetiyê reng vedidin.

Bêguman bi guherîna arasteya siyasî, karîgeriya netewetiya çeprew bi tevahî ji holê ranabe. Lewra di nav kadroyên Partiya Demokrat a Kurdistanê de piraniya ronakbîran di bin tesîra netewetiya çeprew de bûn û li dijî netewetiya nerîtî di nav milmilaneyê de bûn. Ji ber ku heta salên şêstî jî kadroyên rêvebir ên partiyê ji ronakbîrên çeprew pêk tên pênaseya kurdayetiyê ji aliyê van kesan ve tê kirin û kurdayetî di bin sîbera van kesayetan de teşe digire. Lê di sala 1964an de di serkê-

şiya Îbrahîm Ehmed de di navbera serkirdayetiya Partiyê û van ronakbîrên çeprew de dubendî çê dibe û herî dawî ev kes di sala 1966an de diçin aliyê dewletê û li dijî şoreşa Kurdî şer dikin. Li ser vê, di kongreya şeşem a PDKê de bernameya partiyê bi tevahî ji bendên marksîst û lenînîst tê paqijkirin (Kutschera, 2001: 298), partî ji bin sîwana îdeolojiya marksîst derdikeve û kurdayetî wek tekane îdeolojiya netewetiya Kurdî cihê xwe digire.

Amir Hassanpour jî bal dikêşe ser vê diyardeya nû û di wê baweriyê de ye ku di salên 1960î de bi pêşketina hizrên neteweyî, kurdayetî wek sîstemeke hevgirtî ya îdeolojîk derdikeve holê. Digel vê yekê bi dîtina wî kurdayetî heta radeyeke baş di bin tesîra marksîzm û lenînîzmê de teşe digire (Hassanpour, 2005: 138-140). Ji ber vê, ji bilî têkoşîna çekdarî ya li hember hêzên dagirker ên Kurdistanê dijayetiya sîstema feodal, modernkirina civata nerîtî û arastekirina zilamê dînî di çarçoveya armancên neteweyî de dibin armancên şoreşê ku ev armanc karîgeriya marksîzmê bi awayekî aşkera nîşan didin. Ev jî nîşan dide ku herçend kurdayetî ji aliyê siyasî ve ji bereya komunîst derketibe jî nekariye bi tevahî karîgeriya îdeolojiya marksîst ji holê rake û di naveroka kurdayetiyê de rengê netewetiya çeprew diyar e. Lê di her hal û karî de kurdayetî tê wateya dabirîna ji îdelojiya navendî ya marksîzmê û formeke taybet a netewetiya Kurdî.

Di helbesta Kurdî de kurdayetiya vê maweyê herî baş di helbestên Hejar de xwe nîşan dide, lewra Hejar berî Şoreşa Eylûlê nûnerekî netewetiya marksîst bû, lê di serdema şoreşê de her di çarçoveya helwesta serokatiya şoreşê de bi awayekî tund rûbirûyê alîgirên netewetiya çeprew dibe. Loma jî helbestên wî yên vê serdemê wek rojnivîska şoreşê deng û rengê kurdayetiya Şoreşa Eylûlê nîşan dide û dibe neynika çawaniya dabirîna kurdayetiyê ji netewetiya çeprew. Ji ber vê çendê helbestên wî yên vê maweyê di çarçoveya ajîtasyon, îronî û parodiyê de nimûneyên tîpîk ên helbesta şoreşgêriyê ne. Hejar van helbestên xwe bi piranî wek "Demeteqey Pîrot û Bayîz" yan jî "Demeteqey Pîrot û Bapîr" di şeklê diyalog û devjeniyê de pêşkeş dike.

Destpêka dabirîna kurdayetiyê ji marksîzmê di helbestên Hejar de vedigere ser helwesta komunîstên navxweyî. Bi dîtina Hejar ev kes razî nedibûn behsa Kurd û Kurdistanê bê kirin, lewra bi ditîna wan marksîzmê rê nedida "gelperistî"yê (netewetiyê) û nedibû Kurdên marksîst behsa neteweya xwe bikin, lê dema Kurdan ji bo azadiya Ereb û Erebistanê dengê xwe bilind dikir ev ji bo wan nedibû kêşe û gelek asayî bû. Hejar ji bo berçavkirina vê durûtiyê di helbesteke xwe de cih dide diyaloga Pîrot û Bayîz ku Pîrot Kurdekî neteweperwer û Bayîz jî Kurdekî komunîst temsîl dike. Bayîz dema xwe wek komunîstekî dide nasîn, Pîrot wateya komunîstiyê jê dipirse, ew jî dibêje komunîstî bê ciyawazî rizgariya hemû gelên cîhanê û têkçûna kolonyalîzmê ye. Pîrot li ser vê "mizgînî"ya wî, kêfxweş dibe û dibêje wê

çaxê bi saya we komunîstan dê Kurdistan serbixwe bibe. Bayîz li ser vê hêrs dibe û dibêje gotina Kurdistanê neteweperestî ye û dema Kurd behsa Kurdistanê bikin, dê riya pêşketinê li xwe bigirin, li dijî prensîbên komunîzmê rawestin û bikevin bin xizmeta "îstî'mar"ê (Hejar, 1391: 59-60).

Bi dîtina Hejar herçend di bingeha hizrên Marks, Engels û Lenîn de wekheviya gelan hebe jî komunîstên Ereb vê prensîbê ji bo Kurdan napejirînin. Li gor wan eger Kurd serbixwe bibin, dê ji bin barê wan rizgar bibin û ev jî dê di berjewendiya wan de nebe. Lewra hemû samanên serzemîn û jêrzemîn ên Kurdistanê dixwin û amade nînin bi gotineke Lenîn dest ji vê berdin. Hejar ji bo helwesta komunîstan a li hember Kurdan baştir nîşan bide derbarê azadiya cilûberg û zimanê Kurdî de li ser zimanê Pîrot pirsiyarekê dike. Li ser vê Bayîz diyar dike ku xwendina Kurdî cudabûnê dixe nav welat û cilên Kurdî jî (çûxe, fiş, foll, şede û camane) dibin sedema bêxêriya neteweya Ereb. Loma jî ji bo yekîtiyê divê "patoll" bê avêtin û egal bê girêdan, lewra Bayîz wek komunîstekî Kurd diyar dike Kurd jî ji neteweya Ereb in û tu ciyawazî di navbera wan de nîne (Hejar, 1391: 60-61).

Hejar bi vî awayî bi riya komunîstekî Kurd nîşan dide ku Ereb di bin perdeya komunîstiyê de înkara Kurdan dikin û Kurdên komunîst jî ji ber bêhişiya xwe li pey wan diçin. Loma jî Pîrot wek nûnerê neteweperweriya Kurd di kesayetiya Bayîz de vê helwesta komunîstên Kurd wek pejirandina helandina Kurdan di nav Ereban de dide zanîn (Hejar, 1391: 61). Helbestvan ji bo diyarkirina rewşa komunîstên Kurd di destpêka helbesteke xwe ya din de diyar dike ku nivîskarekî Kurd digel çend Erebên komunîst diçe Yekîtiya Sovyetê, lê ev nivîskar qet behsa Kurdan nake. Di bin karîgeriya komunîstên Ereb de kurdbûna xwe li dijî bîr û baweriyên marksîzmê dizane. Li Yerîwanê dema dibîne Kurdên li wir govend digirin bê ku behsa kurdbûn û kurdistanîbûna xwe bike dibêje em jî li "Bakurê Îraqê" weha govend digirin. Loma jî Hejar li ser vê şermokîtiya Kurdên komunîst dîsa di şêweyê diyologê de helbestekê dinivîse. Di vê helbestê de Pîrot û Bayîz behsa Bapîr dikin. Bayîz dibêje Bapîr çûye cihekî weha ku cihê hêviya hemû gelan e. Pîrot jî dibêje eger weha be dê Bapîr behsa Kurdan bike. Bayîz dibêje Mam Bapîr ewçend bi ceger nîne û ji ber ku bûye "zilamekî cîhanî" êdî dest ji kurdîtiyê berdaye (Hejar, 69-70). Bi vî awayî Hejar hem derewbûna biratiya îdeolojîk a Kurd û Ereban radigihîne hem jî diyar dike ku komunîstiyeke bi vî awayî di xêra Kurdan de nîne û ji Kurdan dixwaze ku berê xwe bidin kurdayetiyê. Lewra ew kurdayetiyê "tekane qîble û dînê Kurdan" dizane (Hejar, 95) û netewetiya Kurdî ji têkeliya marksîzmê rizgar dike.

Hejar di maweya Şoreşa Eylûlê de êdî tu hêvî ji Moskoyê û bereya komunîst nake û tekane rizgarkerê Kurdan Barzanî û şoreşa Kurdî dide zanîn. Lewra Kurd bi şoreşa Kurdî di serokatiya Barzanî de êdî mafê xwe bi destê xwe distînin û bi

dîtina wî heta serdarê Kurdan Barzanî be tirsa Kurdan ji tu dijminekî nîne. Kurd bi Şoreşa Eylûlê destê zordar dibirin û di cîhanê de deng vedidin, lewra dijminê ku piyê xwe dide ser axa Kurdistanê bi destê şoreşgêrên Kurd tên sezadan û binax dibin, loma jî bi saya vê azadiyê ne tenê Kurd, gul û kulîlkên Kurdistanê jî baştir li ser axê şîn dibin. Ji ber vê helbestvan ji Barzanî dixwaze ku pêşengiya Kurdan bike heta ku Kurd bigihîjin serxwebûnê (Hejar, 1391: 107-108).

Di gotara netewetiya çeprew de dijminên navxweyî yê Kurdan axa, beg, sermayedar, şêx û mela bûn, lê di maweya Şoreşa Eylûlê de di çaçoveya kurdayetiya vê serdemê de caş cihê van kesan digirin. Ev caş jî ne tenê axa û sermayedar in, di heman demê de Kurdên komunîst ên li dijî şoreşê jî wek caş dibin dijminê navxweyî û Hejar ji vî aliyî ve jî pîvana kurdayetiyê ne li gor îdeolojiya marksîst li gor armancên neteweyî datîne ku di wê serdemê de xwe di alîgiriya şoreşa Kurdî de dibîne. Helbestvan di helbesta "Sirûdî Caş" de diyar dike ku caş ew kes in ku ji bo pere welatê xwe difroşin, dijminê welatperweran in, lewra ji nîştiman û namûsê zêdetir mebesta wan dînar e (Hejar, 1391: 112). Di helbesa "Caş Tûrren" de jî diyar dike caşên Ebdulkerîm Qasim şîrê kerê dimijin û ji bo pere birayê xwe dikujin û ji Be'siyên ku dawî li hukmên Ebdulkerîm Qasim anîne dixwazin ku navê wan nekin "fursan" û bila navê wan herwekî serdema hukumeta berê "caş" bimîne da ku heta mabin wek caşên Mîşel Efleq di xizmeta neteweperestên Ereb de bin (Hejar, 114).

Di sala 1966an de dema Îbrahîm Ehmed û Celal Talabanî wek baskê çeprew ên şoreşa Kurdî diçin aliyê hukumeta Îraqê û şerê Şoreşa Eylûlê dikin di helbestên Hejar de Îbrahîm Ehmed û Celal Talabanî wek "caşên şêst û şeşan" dibin nûnerê hemû caşan. Helbestvan ji bo destnîşankirina îxaneta Îbrahîm Ehmed li ser helbesta wî ya navdar "Yadgar û Hîwa"yê bi navê "Şîrîn Behar e" helbesteke parodîk dinivîse. Di vê helbestê de wek berevajîkirina helbesta Îbrahîm Ehmed, Hejar li ser zimanê wî diyar dike ku Îbrahîm Ehmed ji bo pere û kêfa meyxaneyê gelê xwe firotiye û ji ber ku ji kurdbûnê derketiye wek nanxwarê destê dijminê Kurd rojekê li Bexdadê û rojeke din li Tehranê ye. Helbestvan ji bo ku Îbrahîm Ehmed biçûk bixe diyar dike ku ji bo qedeheke wîskî û konyakê welatê xwe firotiye, di nav vê zewqa serxweşiyê de kurdbûna xwe ji bîr kiriye û ji ber ku hetahetayê kurdbûn û kurdistanîbûna xwe daye aliyekî kesên ku ji xwe re dibêjin Kurd wan dide girtin û azadîxwaziyê jî wek xeyaleke xav dide zanîn (Hejar, 1391: 170-171).

Di pêşekiya helbesteke xwe de Hejar diyar dike ku Îbrahîm Ehmed bi riya çapemeniyê bersiva wî daye, wî wek "Şaîr û Muherrîcî Barzanî" bi "kevneperestî"yê tawanbar kiriye û weha nîşan daye ku herwekî Hejar bi dijûndana dagirkerên Kurdistanê Kurdan dike dijminê Tirk û Fars û Erebên marksîst û bi vî awayî xizmeta "îstî'mar û komperadoran" dike. Li hember vê, Hejar di "Demeteqeyeke Bapîr û Pîrot" de destnîşan dike ku Kurdên komunîst ên mîna Îbrahîm Ehmed kurd-

perweran bi regezperestî, nazîzm û faşîzmê tawanbar dikin, lê dagirkerên welat birayê xwe dizanin, ji ber vê jî kesên mîna Bile (Îbrahîm Ehmed) wek "pîrekerekî" bin barê Be'siyan dide zanîn (Hejar, 1391: 206-208).

Hejar dîsa di pêşekiya helbesteke xwe de diyar dike ku dema kudetaya Ebdulkerîm Qasim bi ser dikeve wek hevkarê bereya komunîst Partiya Komunîst a Îraqê piştgiriya hukumeta Qasim dike û li hember kuştarên hukumetê yên li Mûsil û Kerkûkê jî bêdeng dimîne û dema navbera wan û hukumetê xirab dibe hemû direvin û tên xwe li Barzanî û şoreşa Kurdî digirin. Piştî ku navbera Sedam û Sovyetê baş dibe û peymana petrolê bi wan re îmze dike Be'sî rê didin komunîstan ku bên digel wan kar bikin. Ji ber vê, komunîstên ku xwe li pêşmergeyên Şoreşa Eylûlê girtibûn berê xwe didin Bexdadê û terka pêşmergeyan dikin. Bi dîtina Hejar dema ev komunîst diçin Bexdayê Kurdên ku li serê çiyayên Kurdistanê li dijî Îraqê dicengin bi kevneperestî û sîyonîstiyê tawanbar dikin. Loma jî digel hêzên Îraqî û caşên Kurd êrîşî pêşmergeyan dikin û nankoriya xwe careke din nîşan didin (Hejar, 1391: 210-211).

Diyar e, Hejar îdeolojiya komunîst wek darê destê serdestên Kurdan û îdeoliya pişaftina Kurdan dibîne di nav Ereban de, loma jî wek berdevkê kurdayetiya Şoreşa Eylûlê di çarçoveya pêşhatên siyasî de kurdayetiyê ji jargon û çarçoveya îdeolojîk a marksîzmê rizgar dike. Ev nîşan dide ku kurdayetî herçend ketibe bin karîgeriya netewetiya çeprew jî di salên şêstî de formeke taybet werdigire û hevterîbê derketina Kurdan ji bereya komunîst helbesta Kurdî jî di mînaka helbestên Hejar de ji marksîzmê dûr dikeve. Êdî navenda netewetiya Kurdî ne Ewrûpa ye ne jî Mosko ye; şoreş e û çiyayên Kurdistanê ne, rizgarker jî ne zanista nû ya ewrûpî ye ne jî îdeolojiya komunîst e; serok û rêberên karîzmatîk ên mîna Barzanî ne. Bêguman ev ji bo hemû helbestvanên Kurd ne weha ye, lewra gelek helbestvanên Kurd piştî Şoreşa Eylûlê jî di çarçoveya netewetiya marksîst de helbest dinivîsin û nerîta helbesta salên çilî demeke dirêj didomînin.

## 7. ENCAM

Netewetiya Kurdî ji serhildana Şêx Ubeydulah heta Şoreşa Eylûlê di bin karîgeriya pêşhatên siyasî yên cîhanê de formên taybet werdigire. Mîna ku di helbestên Hacî de jî tê dîtin netewetiya Kurdî yekem car li dijî netewetiya Ermenî û serdestiya Osmaniyan derdikeve. Hacî û Ebdurehîm Rehmî bi riya ajîtasyon û metaforên dînî û nîştimanî li dijî netewetiya Ermenî radiwestin û li hember netewetiya resmî ya Osmanî jî bi gotara serxwebûnxwaziyê derdikevin pêş. Ji Meşrûtiyeta Duyem heta dawiya salên sihî di bin karîgeriya komeleyên çandî û siyasî de netewetiya Kurdî di helbesta Kurdî de bi gotareke çandî û modernxwaz xwe nîşan dide û ji bo serketina

neteweyî zanistê pêşniyaz dike û Ewrûpayê wek model destnîşan dike. Ji salên çilî heta salên şêstî ji ber ku cîhan di nav bereya emperyalîst û bereya komunîst de tê parvekirin û dewletên serdest ên li Kurdistanê jî di bereya emperyalîst de cihê xwe digirin, partî û rêxistinên Kurdî xwe nêzî bereya komunîst dikin û netewetiya Kurdî di çarçoveya îdeolojiya marksîst de di helbesta Kurdî de jinûve pênase dikin. Ev diyarde piştî ku hukumeta Ebdulkerîm Qasim bi piştevaniya Sovyetê êrîşî Kurdan dike û Kurd jî xwe nêzî Rojava dikin, diguhere. Ji ber vê di serdema Şoreşa Eylûlê de netewetiya Kurdî di mînaka helbestên Hejar de ji çarçoveya netewetiya marksîst derdikeve û bi navê "kurdayetî"yê formeke nû werdigire. Ev jî nîşan dide ku îdeolojiya neteweyî di helbesta Kurdî de li gor pêşhatên siyasî û îdeolojiya neteweya dijber formên taybet wergirtiye û angajmanên siyasî û îdeolojîk di çarçoveya berjewendiyên neteweyî de guherîne û neketine pêşiya îdeolojiya neteweyî. Lewra herwekî ku Antony D. Smith jî dibêje netewetî ji bo sîstema civakî û siyasî tenê çarçoveyekê datîne û li gor pêwîstiyên siyasî û civakî bi asanî dikare xwe bi îdeolojiyên dîtir temam bike (Smith, 2002a: 171). Ji ber vê jî netewetiya Kurdî ji destpêka xwe heta salên heftêyî bi çendîn sîstemên fikrî yên mîna dîn, moderniya pozîtîvîst û marksîzmê re dikeve têkiliyê û reng û rûyên taybet werdigire.

## 8. JÊDER


Anderson, B. (2011). *Hayali Cemaatler Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması* (Çapa Şeşem) (İ. Savaşır, Wer.). İstanbul: Metis Yayınları.

Bajalan, D. R. (2010). *Jön Kürtler: Birinci Dünya Savaşından Önce Kürt Hareketi* (B. Yalçınkaya, Wer.). Avesta Yayınları: İstanbul.

Ballekî, Y. R. H. E. (2005). *Sîmakanî Tazekirdinewey Şî'rî Kurdî 1898-1932* (Çapa Yekem). Hewlêr: Spîrêz.

Barzani, M. (2005). *Barzani ve Kürt Ulusal Özgürlük Hareketi II* (Çapa Yekemîn) (V. İnce, Wer.). İstanbul: Doz Yayınları.

Bêkes, F. (1391). *Dîwanî Bêkes* (Çapa Duyem) (M. U. Aşna, Kokirdnewe). Sine: Billawkirdnewey Kurdistan.

Bozarslan, H. (2005). *Türkiye'de Kürt Milliyetçiliği: Zımni Sözleşmeden İsyana* (1919-1925). A. Vali (Amedekar), F. Adsay; Ü. Aydoğmuş & S. Kılıç (Wer.), Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri (Çapa Yekem, r. 199-229). Istanbul: Avesta Yayınları.

Cem'iyet'in Beyannamesi. (1998). M. E. Bozarslan (Wer. ji Tîpên Erebî bo Tîpên Latînî), *Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi* (Çapa Yekem, j. 1, r. 40). Uppsala: Weşanxana Deng.

Cigerxwîn (1992). *Dîwana Yekan – Sewra Azadî.* İstanbul: Weşanxana Deng.

Cegerxwîn (2003). Kî me Ez (Çapa Sêyem). Stenbol: Avesta Basın Yayın.

Cigerxwîn (1997). *Zend-Avista* – Şefeq (Çapa Duyemîn). İstanbul: Weşanên Deng.

Cigerxwîn (2000). *Hêvî – Aşitî* (Çapa Duyemîn). Stenbol: Weşanên Deng.

Dildar (1985). *Dildar Şaî 'rî Şorişgêrî Kurd*. E. Elaedîn (Amadekar). Bexdad: Darul Afaq Erbiyetu Sehafetu wen neşir.

'Elî, C. (2013) *Nasyonalîzm û Nasyonalîzmî Kurdî* (Çapî Duwem). Hewlêr: Endêşe bo Çap û Billawkirdnewe.

Gellner, E. (2013). *Milliyetçiliğe Bakmak* (Çapa Pêncemîn) (S. Coşar, S. Özertürk, N. Soyarık, Wer.). İletişim Yayınları: İstanbul.

Goran, E. (1389). *Dîwanî Goran* (Çapî Çwarem) Tihran: Billawkirawey Panîz.

Hakkı, B. İ. (1998). *Kürdler ve Kürdistan*. M. E. Bozarslan (Wer. ji Tîpên Erebî bo Tîpên Latînî), *Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi* (Çapa Yekem, j. 1, r.45). Uppsala: Weşanxana Deng.

Hakkı, B. İ. (1998). Kürdçeye Dair. M. E. Bozarslan (Wer. ji Tîpên Erebî bo Tîpên Latînî), *Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi.* (j. 1, r. 141-143). Uppsala: Weşanxana Deng.

Harpûtlu, H.B. (2013). Garbla Şark, Milliyet Cereyanları (103-104). Koma Xebatên Kurdolojiyê (Amadekar), *Rojî Kurd* (Çapa Yekem). İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Hassanpour, A. (2005). *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil 1918-1985* (Çapa Yekem) (İ. Bingöl & C. Gündoğan, Wer.). İstanbul: Avesta Yayınları.

Hejar (1391). *Bo Kurdistan* (Çapa Heştem). Sine: Pexşangay Hejar.

Hêmin (2708). *Dîwanî Hêmin Sercem Şî'rekanî Mamosta Hêmin*. Silêmanî: Pexşangay Azadî.

Hobsbawm, E. (2012). *Devrim Çağı,* (Çapa Şeşem) (M. S. Şener, Wer.). Ankara: Dost Kitabevi Yayınları.

Jigalina, O. İ. (2010). İkinci Dünya Savaşından Sonra Kürdistan (1945-1960). M.S. Lazarer & Ş.X. Mıhoyan (Ed.) & İ. Kale (Wer), *Kürdistan Tarihi (*r. 265-290). İstanbul: Avesta Yayınları.

Jusdanis, G. (1998). *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür Milli Edebiyatın İcat Edilişi* (Çapa Yekemin) (Tuncay Birkan, Wer.). İstanbul: Metis Yayınları.

Jwaideh, W. (2014). *Kürt Milliyetçilinin Tarihi Kökenleri ve Gelişimi* (Çapa Heştem) (İ. Çekem& A Duman, Wer.). İstanbul: İletişim Yayınları.

Koyî, H. Q. (2707). *Dîwan* (S. H. Mîran & K. M. Şarezan, Lêkolînewe û Lêkdanewey). Sine: Şarekitêbî Mîdya.

Kutschera, C. (2001). *Kürt Ulusal Hareketi* (F. Başkaya, Wer.) İstanbul: Avesta Yayınları.

Lenîn, V.Î. & Stalîn, J.V. (2014). *Marksîzm û Pirsgirêka Neteweyî* (Çapa Yekemîn) (T. Ok, Wer.). Stenbol: Evrensel Basım Yayın.

Mîre, E. (2012). *Karîgerî Bizûtnewey Roşinbîrî û Edebîye Kurdîyekan Le Ser Komelgay Kurdî Başûrî Kurdistan* (1970-2003). Silêmanî: Çapxaney Renc.

Özkırımlı, U. (2013). *Milliyetçilik Kuramları Eleştirel Bir Bakış* (Çapa Çarem). Anakara: Doğu Batı Yayınları.

Pîremêrd (2001). *Pîremêrd û Pêdaçûnewey Nwêy Jiyan û Berhemekanî* (Bergî Yekem) (U. Aşna, Kokirdnewe û Lêkollînewey). Hewlêr: Dezgay Çap û Billawkirdnewey Aras.

Qani‘ (1391). *Dîwanî Qani‘* (Çapî Hewtem) (B. Qani‘, Kokirdnewey). Tihran: Çapxaney Dallahu.

Qedrî Can (2009). *Hemû Berhemên Wî* (Çapa Yekem) (R. Jiyan, Amadekar). Stenbol: Belkî.

Rehmî, E. (1985). *Bang*. M. E. Bozarslan (Amadekar), Jîn (b. 1, j. 1, r. 193). Uppsala: Weşanxaneya Deng.

Rehmî, E. (1985). *Gaziya Dûmahîkê*. M. E. Bozarslan (Amadekar), Jîn (b. 5, j. 23, r. 977). Uppsala: Weşanxaneya Deng.

Rehmî, E. (1985). *Halê Me yê Hazir.* M. E. Bozarslan (Amadekar), Jîn (b. 2, j. 6, r. 347-348). Uppsala: Weşanxaneya Deng.

Rehmî, E. (1985). *Heyyealessala.* M. E. Bozarslan (Amadekar), Jîn (b. 3, j. 13, r. 582). Uppsala: Weşanxaneya Deng.

Rehmî, E. (1985). *Ji bo Civata Dayîkan*. M. E. Bozarslan (Amadekar), Jîn (b. 5, j. 22, r. 942). Uppsala: Weşanxaneya Deng.

Rehmî, E. (1985). *Ji bo Nesla Têt*. M. E. Bozarslan (Amadekar), Jîn (b. 2, j. 8, r. 408-410). Uppsala: Weşanxaneya Deng.

Rehmî, E. (1985). *Nezanîn*. M. E. Bozarslan (Amadekar), Jîn (b. 4, j. 17, r. 758). Uppsala: Weşanxaneya Deng.

Rehmî, E. (1985). *Selaya Şevê*. M. E. Bozarslan (Amadekar), Jîn (b. 2, j. 6, r. 349). Uppsala: Weşanxaneya Deng.

Rehmî, E. (1985). *Xewa Me*. M. E. Bozarslan (Amadekar), Jîn (b. 1, j. 1, r. 194). Uppsala: Weşanxaneya Deng.

Smith, A. D. (2002). *Küresel Çağda Milletler ve Milliyetçilik* (Çapa Yekem) (D. Kömürcü, Wer.) İstanbul: Everest Yayınları.

Smith, A. D. (2002). *Ulusların Etnik Kökeni* (Çapa Yekem) (S. Bayramoğlu & H. Kendir, Wer.). Ankara: Dost Kitabevi Yayınları.

Şêx Nûrî Şêx Salih (2008). *Dîwanî Şêx Nûrî Şêx Salih* (Çapî Duwem) (A. Ebdulwahîd, Kokirdnewe û Saxkirdnewe). Hewlêr: Dezgay Çap û Billawkirdnewey Aras.

Zawadzki, P. (2010). Milliyetçilik, Demokrasi ve Din. A. Dieckhoff & C. Jaffrelot (Amadekar) & D. Çetinkasap (Wer.), *Milliyetçiliği Yeniden Düşünmek ve Uygulamalar* (r. 209-244). İstanbul: İletişim Yayınları.

Zêwer (2008). *Dîwanî Zêwer* (Çapa Duwem) (M. Zêwer, Amadekar). Hewlêr: Dezgay Çap û Billawkirdnewey Aras.

## Extended Abstract

Nationalism arose towards the end of the 18th century in Eastern Europe and spread to the world in a century by the means of war and colonialism. Kurdish nationalism emerged, counter to formal nationalism of Ottoman Empire, with the Şêx Ubeydullah Uprising in 1880 and was influenced by the Armenian national awakening. Hacî Qadir Koyî, as the poet of this event, was the first one to convey the knowledge about the event to Kurdish nation with his poems. Hacî brought Kurdish nationalism into the forefront in response to both tyranny of Ottoman Empire and Iran and aims of the Armenian nationalism. Due to religious discrepancies between Kurds and Armenians and the influence of religion on society, Kurdish poets constructed Kurdish nationalism with religious terminology and associated Kurdish nationalism with religion. Especially, Ebdurehîm Rehmî used religious symbols in his poems within the context of nationalism and this usage became pioneer form of Kurdish nationalism.

Between the Second Constitutional Era and 1940, Kurdish nationalism came to the fore with a cultural and modernist discourse. Kurdish associations, newspapers and magazines in Istanbul and Sulaymaniyah were at the core of this nationalism. Kurdish poets, as well as the staff members of those associations and colum-

nists of magazines and newspapers, encouraged Kurds to read, make progress, do scientific researches and showed Kurdish nation that learning was the only way of development. Undoubtedly, 19. Century positivism, which interpreted learning as the absolute truth and casted a divine role to learning, was the underlying reason of those romantic ideas. Actually, Europe and the improvements in Europe were the models of Kurdish nationalist poets.

Kurdish nationalist discourse was influenced by communist front after 1940 and the structure of Kurdish nationalism changed after that effect. Kurds were influenced naturally by communist front because at that time the world was divided in two parts between communism and imperialism and hegemonic countries in Kurdistan, Turkey, Syria, Iran and Iraq, were on the side of imperialism. Within this scope, poets like Goran, Cegerxwin, Qanî Hejar, Qedrî Can, Dildar differed from predecessor poets by reforming the context and characteristics of Kurdish nationalism. Discourse of the nationalism for those previous poets had showed instead of learning communist ideology as the way of liberation. In addition, Turkish, Arab and Persian proletarians and communists were tackled as ally and friends of the Kurds although possessors, aghas, beys, sheikhs, and melas (sect leaders) were identified as the alliance of imperialist side and expelled from being Kurds. By this way, Kurdish nationalism and Marxism were connected and a new form of Kurdish nationalism was created.

With the beginning of September revolution, Kurdish nationalist rhetoric turned into a new form. As communist states supported the Ebdulkerim Qasim government against Kurdish revolution Kurdish revolution got closer to the west and they had a critical perception towards communist fronts. This indicated that, Kurdish nationalism recovered itself from Marxist engagements with the leadership of the Kurdistan Democratic Party and showed that Kurdishness was a component on its own. According to the new perspective, in his poems Hejar, regarded Kurdish revolution as the liberation of Kurds instead of the communism. Therefore, in his poetry, Hejar, as the peshmerga and poet of September revolution, criticized communist Kurds for waiving from the rights of Kurds and being under the influence of Arabs. The poet named aghas, beys, melas (sect leaders), sheikhs as Cash (colts), which connotes traitor to their nations, and accused Ibrahim Ehmed and Jalal Talabani, targeting all their fellow leftist Kurdish intellectuals who were against the revolution, of being CASH (colts). This shows that, due to developments of the world in the centuries the content and structure of Kurdish nationalism changed and those changes were obvious in the discourse and writing of nationalist Kurdish poets.